# Reşê Şevê daket taxan



Mîhrîcana Şanoya Enqereyê ya Navneteweyî bo lîstikên kurd jî cih dan bernameya xwe. Di mîhrîcanê de lîstika şanoyê ya bi navê "Reşê Şevê" derdikeve ser dikê. Lîstik di 15'ê mijdarê roja yekşemê li Salona Şanoya Çar Demsal a Şaredariya Yenimahalleyê tê pêşberî temaşevanan... RÛPEL - 9



## Gelo bi rastî qiyamet tê?

Spekulasyonên li ser 2012'an her ku diçe zêdetir dibin û bêhtir pişta xwe didin salnameya çanda Maya. Salnameya Gelê Maya, ji aliyê gelek dezgehên zanistî ve, ji ber rastiya xwe ya li ser pîvan û encamên demsalan û atronomiyê, cidî tê dîtin. Li gorî salnameya Çanda Maya, di 21'ê çileyê 2012'ê de dawiya salnameyan e. Kovara Vetenskap li Swêdê, li ser bingeha zaniyariyên ji saziya NASA'yê ya li Amerîkayê û kesên pispor, pirs kir mijara nîqaşê û hemû nêrîn di hejmara nû ya kovarê de belav kir... RÛPEL - 9



*Meclîsa Gel di civîna xwe ya awarte de nîqaşên tasfiyekirin û belavkirina Wargeha Mexmûrê nirxand û lîstikên ku li ser wargehê tên meşandin bi daxuyaniyeke çapemeniyê deşîfre kirin.*

# Li Mexmûrê polîtîkayên şerê taybet

**Meclîsa Mexmûrê planên tasfiyeyê yên dewleta tirk deşîfre kirin û diyar kir ku ji bo vegerê şert û merc pêk nehatine. Meclîsê ji Hikûmeta Kurd xwest nebe şirîkê plana bêyom**

Piştî komên aştiyê yên Mexmûr û Qendîlê çûn Tirkiyeyê, dewleta tirk planên tasfiyekirina Wargeha Penaberan a Mexmûrê zêdetir xistin rojeva xwe. Bi vê armancê gavên destpêkê yên wekî astengkirina çûn û hatina wargehê dorpêçkirina wargehê, di nav wargehê de xebatên sîxuriyê pêş xistin, ji gel re teklîfên ajantiyê kirin, bi xapandin û bi gefan bi awayekî veşartî ji bo şêniyên Mexmûrê bibin Tirkiyeyê gavên nepenî ji aliyê kordînasyona sêalî ve tên avêtin... R.4

**Çima ji Mexmûrê ditirsin?..**

Heqî BOLTAN - R.2

ROJEV

14 Mijdar - Şemî 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 2

## Faşîzma CHP'ê û niyeta AKP'ê

Pêvajoya nîqaş û minaqeşeyên hikûmetê yên li ser pirsgirêka kurd gihiştin merheleya xwe ya herî krîtîk û diyarde... AKP li şûna ku naverok û armancên xwe aşkera bike her tim dibêje; 'ev pêvajoyek e û ew didome.' Lê xuya ye ku bi vê gotina xwe dixwaze hin tiştan veşêre...

Tayîp TEMEL - R.2

## Ji xiyanetê hesap pirsî

Raya giştî Fatma Bozdemîr bi 'Lîstika Jehrê' nas kir.



Çavrê, ji aliyê JÎTEM'ê ve bi mebesta ku jehrê bibe Herêmên Parastina Medyayê hatibû şandin. Li Herêmên Parastina Medya li xwe mikur tê bi jiyan û rêhevaltiya gerîla bandor dibe. Piştre jî biryara tevlîbûna refên gerîla dide. Dema li Zagrosan bû, di êrişeke hewayî de jiyana xwe ji dest da... R7

# BO TASFIYEKARIYÊ KETIN PÊŞBAZIYÊ

Hikûmeta AKP'ê plana xwe ya çareseriya pirsgirêka kurd bir Meclisa Tirkiyeyê. Lê ji bilî hin xalên ji rêzê yên wekî; axaftina bi kurdî di girtîgehan de, weşana televizyonan ya bi kurdî tiştekî din cih negirt. Baykal û Bahçelî dîsa riya qetlîamê nîşan da. DTP'ê Komîsyona Çareseriyê pêşniyar kir

**NÛÇE:**



## Malbatê Fetahiyan defin kir

Cenazeyê Îhsan Fetahiyan ê ku di 11'ê mijdarê de ji aliyê dewleta Îranê ve hate bidarvekirin bi şerta ku merasîma girseyî neyê çêkirin dane malbatê. Malbatê cenaze bir Kirmaşanê û li wir defin kir... R8

**NIVÎS Û ANALÎZ:**

EHMEDÊ BIRA R8

LERZAN JANDIL R8

## Şopa Denîz û Taniş li Kerboranê ye

Der barê Serdar Taniş û Ebubekîr Denîz ên ku ji aliyê leşkeran ve hatibûn binçavkirin û piştre agahî nehatibûn girtin, agahiyên nû derketin holê. Taniş û Denîz li Kerborana hatine definkirin. Piştre jî ji wir hatine derxistin û birine ciheke din. Şahidê bûyerê diyar kir ku ev agahî di nava gel de belav bû û wê demê HADEP'ê jî ev îdia anî rojevê... RÛPEL -3

## Sûriyeyê daye ser riya Tirkiyeyê

KCK-Rojava diyar kir ku malbatên girtiyên PYD'î yên di girtîgeha Edrayê de ji bo serdana zarokên xwe yên girtî bikin li ber dergehê kom bûn rastî astengiya dewletê hatine. Hate gotin ku rêveberiya girtîgehê nehişt malbat girtiyan bibînin. Malbatên girtiyan dan zanîn ku ew ji jiyana zarokên xwe bi fikar in... RÛPEL - 6



### Ji Greanpeace çalakiya balkêş

*Greanpeace giştînameya santralên nukleer ya ji aliyê Dadgeha Bilind ve hatiye betalkirin lê hikûmet ji nû ve tîne rojevê protesto kir. Endamên Greanpeace li Meydana Tunelê bi armanca balê bikişînin ser mijarê bi koma muzîkê ya Abarjazz Avandgard çalakiyeke protestoyê pêk anî. Maske û cilên endamên Greanpeaceyê bala xelkê derdorê kişand.*

### BEŞÎR ATALAY TIŞTEKÎ NÛ NEGOT

Wezîrê Karên Hundir Beşîr Atalay di axaftina têkildarî hewldana çaresariya kurd de kirî, gavên avêtine ji parlamenteran re vegotin. Atalay diyar kir ku Makezagon bersivê nade daxwazên civakê û hewceyî bi makezgoneke azadîxwaz, pir rengî û demokratîk heye. Atalay çareserî wekî; vekirina beşên kurdolojiyê, weşana bi kurdî û axaftina bi kurdî bi nav kir.

### 'WERIN EM PIRSÊ ÇARESER BIKIN'

Hevserokê Partiya Civaka Demokratîk (DTP) Ahmet Turk di parlamentoyê de li ser hewldana çareseriya pirsgirêka kurd êşên kurdan kişandin, polîtîkaya înkarê û zordarî vegotin. Turk banga azadiyê kir û wiha got: "Îro em hene, sibê em dê nebin. Lê gelên me dê tim hebin. Ji bo ku gelê me, me bi rêzdarî bi bîr bînin werin da vê pirsgirêkê çareser bikin."... RÛPEL -5

## Baykal: Kurdên gelê tirk hene

Di danişîna parlamentoyê Serokê Giştî yê CHP'ê Denîz Baykal di axaftina xwe de anî ziman ku li Tirkiyeyê nasnameyên etnîkî yên cuda hene. Baykal dema nêrîna xwe ya ji bo nasnameyên cuda anîn ziman gotineke skandal bi lêv kir: Li Tirkiyiyê kurd hene. Ev kurdên gelê tirk in. Vê qebûl bikin."

# Tirsa ji Mexmûrîstanê

**Li Mexmûrê endezyariyeke civakî hat ceribandin. Li wir çand û zimanê kurdî di pêşengiya siyasî û rêveberiya herêmî pêk hat. Tirsa a ji Mexmûrê ev e**

HEQÎ BOLTAN

Roja 10'ê mijdarê li ser 'çareseriya hewildanên demokratîk' (vekirina demokratîk) li parlamentoya Tirkiyeyê nirxandin hat kirin. Di komcivîna parlamenê de xwîn ji axaftin û nirxandinên hin parlamenteran diherikî. Ev derdor xwedî helwesta diyar bûn û ji xwe wan jî didûliyeke biçûk rûyê xwe yên tevkuj careke din nîşan dan. Lê mijara esasî beşa din bûn. A ku digot em li dû çareseriya demokratîk in. Mijara wan bi taybetî valakirina Wargeha Mexmûrê ye. Mijara taybet a vê danişîna parlamenê jî valakirina Wargeha Mexmûrê ye.

Bi min ev mijar balkêş û nirxadina wê ya li Parlamena Tirkiyeyê ne tişteke ji rêzê ye. Yanî ev ne tiştekî mehsûmane ye. Di pêşiya vê de, di peyiya vê de, di der dorê vê de wek ku pir tişt hebin!

Ji bo ku ev tiştên ne mehsûmane ên di nav vê helwesta kohne de hene derkevin holê bersiva pirsa "Çima Mexmûr?" girîn e.

Belê çima Maxmûr? Lê ne çima tiştekî din?

Çima bi milyonan penabêrên kurd ên diyasporayê nabe mijara danişîna parlemena tirk? Çima tenê 11 hezer penaberên Mexmûrê dibin mijara danişîne parlemena tirk? Çima bi milyonan kurdên penaber ên li metropolan nabin mijara danişîna parlemena tirk û Mexmûr dibe mijar?

Gelo bi milyonan kurdên penaber ên navxweyî yên bê mal, bê star, bê debar nabin mijara parlemenê lê penaberên Mexmûrê dibin mijara danişînê.

Heke sedem xizanî be penaberên ku ji Mexmûrê xizantir bin hene û pir in. Heke sedem tinebûna starê be penaberên ku li salane stareke wan nîn e û di zivistanên reş û dirêj de di bin konên naylonî de dijîn ne hindik in. Rewşa penaberên diyasporayê jî li holê ye û ne hewceye mirov vê vebêje. Kin û kurmancî ji welatên xwe yên şêrîn bi dehan salan in hatine durxistin.

Lê di van mînakan de jî me bersiva 'Çima Mexmûr?' negirt.

Belê Çima Mexmûr?

Bersiva vê pirsê, xisûsyeta Mexmûrê de bi xwe ye. Taybetiyeke Mexmûrê heye ku bala her kesî kişandiye. 'Mexmûrî' roja ji cih û warê xwe ji ber zilm bû zora dewleta tirk derketin heta îro di kontrola PKK'ê de bû ceribandina avasaziya civakî. Li Mexmûrê endazyariyeke civakî pê hat. Li Mexmûrê endezyariyeke civakî hat ceribandin. Li wê çand û zimanê kurdî di pêşengiya siyasî û rêveberiya herêmî ya Mexmûrê de dest bi jiyana nûjen kir.

Bi ser ket. Zarokan bi zimanê zikmakî dest bi perwerdeyê kirin. Zarokên kurd bi zimanê zikmakî perwerda sereteyî kuta kirin û dîplama standin. Dibistana navîn û lise jî bi serkeftî qedandin. Zanîngeh jî xwendin û bûn xwedî kariyera akademîk. Belê ev serkeftin bû navenda zêrandina civaka kurd. Ew kurdên ku Mexmûr dît û şopand feyza wan ya ji bo kurdî hilpekiye.

Gotin Mexmûr madela jiyana min a kurd e.

Pergala paşeroja min a kurd e.

Belê li Mexmûrê hemû teorî û tespîtên fermî yên pergala tirk hatin pûçkirin. Kurdan li Mexmûrê nîşan da ku dikare bibe xwedî pergal. Kurdî kare bibe zimanê nivîskî. Kurd kare bi kurdî kariyera xwe ya akademîk temam bike. Kurd kare bi vê kariyerê rêveberiya gelê xwe bê ku pirsgirêk bijî bi rêve bibe.

Belê bersiva pirsa me jî ev e.

Dewleta Tirk û hikûmeta AKP'ê ne ji humanîstiyê û ne ji evîndariya ji bo Mexmûrê Mexmûr kirine rojeva xwe. Armanca wan eve beriya ku Mexmûr bibe modela bi giştî ya kurd çewa têk bibin û ji ber çavan rakin. Ji ber vê jî konsepta dijberiyê di dewrê de ye.

Dijberiya bi lugat û lîteratura 'demokratîk' hatiye xemilandin di dewrê de ye.

Di nav vê xweş-bêşiya sofîstîk de dixwazin pergala serkeftî ya Mexmûrê ji holê rakin. Werin em destûr nedin vê û Mexmurê bikin Mexmûrîstan a Kurdistanê.



# Li dayikên kurd xwedî derkevin

SERBEST RÊZAN

Dema min li Roj TV'ê temaşe dikir, dîmenên dayikên aştiyê yên di sala 2006'an de yên ku li Amedê di bin jopên polîsên tirk de hatin bîra min. Lê dîmenên vê carê ne yên paytexta Kurdistanê Amedê bûn, dîmen yê rojavayê Kurdistanê bajarê Helebê bûn. Her çende ev bûyer li cih û demên cûda yên welat be jî, lê mixabin yên dilşewat û mexdûr dîsa dayîkên me kurdan bûn.

Dewleta Sûriyeyê li rojavayê Kurdistanê, bi kiryarên xwe yên hovane têr nebûn edî dest avêtin 'ezmûn û tecrûbeyên' dewleta Tirkiyeyê jî. Hêzên Sûriyeyê êrîş birin ser girseya ku ji bo merasîma îlana 3 şehîdên Tevgera Azadiya Kurdistanê civiyabûn û dayîkên kurd dane ber dar û jopan. Polîsên Sûriyeyê yên ku bi şovenîzma rêjîma Baasê 'terbiye' bûne, dayîkên kurd di bin piyan û jopên xwe de hiştin. Li bajarê Helebê dayîkên kurdan, merasîma îlana 3 şehîdên azadiyê li dar dixistin. Lê careke din polîsên rêjîma dagirker a Sûriyeyê li hestên dayikên dilşewat tehemûl nekirin û mudexele kirin.

Mebesta polîsên Sûriyeyê ji êrîşan tirsandina gelê kurd e. Dewleta Sûriyeyê bi peymana stratejîk a di navbera xwe û Tirkiyeyê de, bi Tirkiyeyê re nîşan bide, bi hemû lêza xwe ve polîtîkaya qirkirina kurdan daye ber xwe. Netehemûliya rêjîma Sûriyeyê ji tilîlî û hestên dayîkan re, encama têkiliyên Sûriye û Tirkiyeyê ye. Êrîşên Sûriyeyê li ser dayîkên şehîd û gerîlayên azadiyê, ji bo Tirkiyeyê peyam e. Yanî ji Tirkiyeyê re tê gotin ku tu çendî kurdan bikujî û biçewisînî, em ê piştgiriyê bidine te. Ev peyama qirkirina kurdan a Sûriyeyê di serdana Beşar Esad a Tirkiyeyê de, bi zelalî hatibû dayîn. Êrîşa dawî jî nîşana vê yekê ye.

Piştî bûyera roja sêşemê ya ser dayîkên kurd, xala herî girîng ku pêwîst e mirov li ser raweste, ew e ku gelo çima li hemberî êrîşên dewleta Sûriyeyê em kurd bêdeng dimînin? Dewleta Sûriyeyê ji bo ku polîtîkaya xwe ya inkarê bi ser bixe, hem li derve, hem jî li hundir lihevhatin pêk anî. Lê çima em nikarin hêza xwe ya cewherî derxînin holê û yekîtiya kurdan nîşan bidin? Her wiha çima em nikarin coş û heyecana bakurê Kurdistanê ji xwe re bikin ezmûn û bi yek helwestê sekna xwe nîşanî dagirkeran bidin? Ev hemû pirsên girîng in ku pêwîst e her ferd û her rêxistinek li rojavayê Kurdistanê ji xwe bike û bersiva wan bide. Pêwîst e aliyên siyasî yên ku qaşo bi navê kurd siyasetê dikin ji xwe bipirsin; Gelo çima du welatên dagirker li ser Kurdistanê dibine yek û em nikarin mor dikin lê em nikarin yekîtiya xwe saz bikin?

Riya rizgariya ji zilma rejîma Baasê û zextên rayedarên dewletê, di yekîtiyê û xwedîderketina li nirxên pîroz re derbas dibe. Xwedîderketin li dayîkên kurd, bi têkoşîn û çalakiyên demokratîk re derbas dibe. Encax bi çalakiyên demokratîk û têkoşîna Parastina Rewa, em ê bikaribin dewleta tirsê rejima Sûriyeyê bînin rayê.

## Deng

## Helwesta CHP - MHP'ê û niyeta AKP'ê

TAYÎP TEMEL tayiptemel@walla.com

Pêvajoya nîqaş û minaqeşeyên hikûmetê yên li ser pirsgirêka kurd gihiştin merheleya xwe ya herî krîtîk û diyarde. Her çiqas rayedarên AKP'ê di her derfetê de bi peyva 'tasfiyekirina PKK'ê' niyeta xwe ya esasî aşkera kiribe jî li hemberî pirsên li ser naveroka 'Plana Kurd' de her tim gotine; 'em ê mijarê bibin parlementoyê û em ê li wir naverok û şeklê dawî bidin planê'.

Duh piştî nîvro plana navborî anîn meclisê. Lewre divê mirov li axaftin û nêrînên wan binêre. Bi vî rengî mirov dê fêm bike ka çiqas samîmî ne.

Di nîqaşên 10'ê mehê de tiştên derketine holê balkêş in. MHP û CHP bêyî ku şerm û fedî bikin li çavên parlementerên kurd û li çavên gelê kurd nihêrîn û gotin; 'çareserî qetlîam û komkujî ye'. Onur Oymen ê ku li ser navê dewleta tirk bi salan li derveyî welat dîplomasî meşandiye raste rast got; 'kurdan qetil bikin'. Dîsa hemû partiyan hevdu bi îthamên pir giran sûcdar kir.

Balkêş e ku hemûyan jî ji ber pêşwazîkirina Komên Aştiyê DTP wekî hedef nîşan da. Hin ji wan ji DTP'ê dixwazin ku di plana wan a tasfiyekirinê de rol bilize û ji wan re bibe alîkar. Ji bo rayedarekî dewletê ev xwestek şerm û bêrûmetiyeke mezin e.

Lazim e êdî bê fêmkirin ku kurd bi mafên takekesî û xapînok bawer nakin. Her wiha pişta xwe li nirx û nûnerên xwe yên esasî nazivirinin. Berê xwe nadin tiştên biçûk. Ev merhele êdî gelek li paş maye. Lazim e êdî AKP di vî warî de xwe îkna bike. Dibe ku bi çend hewldanên tepeserkirin û zextdayînê çareseriya esasî bi derengî bixe, lê ne mimkûn e ku çareseriya xwe pêk bîne û bibe serî.

Êdî cihê baweriya ji demogojiyên klasîk ên wekî; 'welat parçe dibe, dewlet ji dest diçe' nemaye. Duh Ahmet Turk bi vê gotinê ev rastî raxistin ber çavan; "Bi qasî ku me li cem hev bigirin, nirxên me hene û ew dê her tim hebin jî. Tu pirsgirêka kesê bi al û sînoran re tune ye û nabe jî. Zimanê hevpar ê Tirkiyeyê dikare tirkî be. Lê ji bo yên ku bi zimanê xwe yê dayikê perwerde bibin jî 'tirkî' dikare bibe zimanê hevpar ê ragihandin û fêmkirinê."

Ev daxwazên ku birêz Turk anîne ziman li gorî daxwazên gelê kurd ên esasî gelek maqûl û heta mirov dikare bêje nerm in jî. Lê birêz Turk helwesta kurdan a li hemberî hebûna dewletê bi çarçoveyeke rast û durist aniye ziman.

Lê xetereyek heye ku ji ber van zimandirêjî û êrîşên ne exlaqî yên CHP û MHP'ê dibe ku naverok û niyeta hikûmetê manîpule bibe û her wekî çareserî bê fêmkirin. Ev şaşfêmkirin û dibe ku kurdan ji rojeva wan a esasî dûr bixe. Lewre jî bi qasî lanetkirin û şermezarkirina helwesta CHP û MHP'ê divê zêrevanî û hişyarî li hemberî plan û projeyên ku bi navê çareseriyê tên meşandin û ji rastiya çareseriyê dûr in jî hebe.

AKP li şûna ku naverok û armancên xwe aşkera bike her tim dibêje; 'ev pêvajoyek e û ew didome.' Lê xuya ye ku bi vê gotina xwe dixwaze hin tiştan veşêre. Lê her kes jî dizane ku projeyên çareseriyê pirsgirêkên bi vî rengî bi diyarkirina merheleyên pêşîn, navîn û dawîn tên amadekirin û bi wî rengî tên meşandin. Ligel vî yekê jî divê pêngavên ku di her merheleyê de bên avêtin ji raya giştî re bên aşkerakirin.

ROJEV

**Zozan Basın Yayın Adına**
**İmtiyaz Sahibi:** Eser UYANSIZ
**Yazı işleri Müdürü:** Mustafa AGGÜL

**Yönetim Yeri:** Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
**İdare Tel:** 0 (412) 251 38 88
**Yayın (Weşan)**
**Tel:** 0 (412) 237 48 91 **Fax:** 0 (412) 237 48 89
**Baskı(Çap):**
**Stenbol:** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL Tel:0 (212) 580 63 81
**Edene:** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
**Yaygın Süreli Yayındır**

# Mexmûriyan plan deşîfre kirin

**Meclîsa Gel a Mexmûrê planên tasfiyekariyê yên dewleta tirk deşîfre kirin û diyar kir ku ji bo vegera Tirkiyeyê şert û merc pêk nehatine. Meclîsa Gel a Mexmûrê bangî Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê jî kir ku nebin parçeyê fenên Tirkiyeyê**

Piştî komên aştiyê yên Mexmûr û Qendîlê çûn Tirkiyeyê, dewleta tirk planên tasfiyekirina Wargeha Penaberan a Mexmûrê zêdetir xistin rojeva xwe. Bi vê armancê gavên destpêkê yên wekî astengkirina çûn û hatina wargehê dorpêçkirina wargehê, di nav wargehê de xebatên sîxuriyê pêş xistin, ji gel re teklîfên ajantiyê kirin, bi xapandin û bi gefan bi awayekî veşartî ji bo şêniyên Mexmûrê bibin Tirkiyeyê gavên bi awayekî nepenî ji aliyê kordînasyona sêalî ve tên pêşxistin, ji aliyê mexmûriyan hatin deşîfrekirin.

**'Xebatên sîxuriyê dikin'**

Li Wargeha Mexmûrê piştî qasidên aştiyê yên Mexmûrê çûn Tirkiyeyê, zext û pêkutiyên dewleta Tirk û kordînasyona sêalî zêdetir bû. Dewleta Tirk piştî çûna koman diyarkiribû ku wê di vê pêvajoyê de zêdetir li ser Mexmûrê rawestin. Bi vê boneyê dewleta Tirk talebên koma aştiyê ya Mexmûrê ji nedîtî ve tê û ji bo hin malbat û take-kesên gelê Mexmûrê bixapîne û bibe Tirkiyê dest bi faeliyetên sîxurtiyê kir.

Meclîsa Gel a Demokratîk a Mexmûrê li ser mijarê civîna awarte ya Meclîsa Gel pêk anî. Meclîsa Gel di civîna xwe ya awarte de nîqaşên tasfiyekirin û belavkirina Wargeha Mexmûrê nirxand. Di civînê de hate diyarkirin ku piştî vekirina balyozxaneya tirk a li bajarê Başurê Kurdistanê Hewlêrê planên dewleta tirk ên li ser Wargeha Penaberan a Mexmûrê zelal bûn.

**Hikûmeta Iraqê ket dewreyê**

Di civîna Meclîsa Gel de hate diyar kirin ku ji bo pêkanîna vê planê ji aliyê kordînasyona sêalî û hikumeta navendî ya Iraqê ji bo muduriyeta îdareya wargehê ku berê bi hikumeta Herêmî ya Federal ve girêdayî bû mudur û heyetek nû hate wezîfedarkirin. Îbrahîm Mihemed Elî'yê ku ji bo xebatên sîxurî hate wezîfedar kirin Kurdekî ji eşîra Şebekan e û ji Mûsil'ê ye. Di civînê de li ser pêkanînên plana valakirina wargehê jî wiha hate gotin; "Çarçeveya plana wan jî wiha ye; hatûçûna şêniyên Mexmûrê ên derve destpêkê wê bixin bin kontrolê, zaniyariyên sixurî wê werin berhevkirin û wê hewl bidin ku rêxistina gelê Mexmûrê belav bikin. Ne weke girseya penaberên siyasî lê weke take-kes û malbatan, bi qewlê pere dayîn, xapandin û bi gefan dixwazin bêyî ewlekarî û misogeriyek a NY'ê Mexmûriyan bişînin Tirkiyê. Bi vê armancê despêkê xwendevan û karkerên li devreyî wargehê dixebitin wê bikin hedef."

**'Şertên vegerê nîn in'**

Piştî civînê ji aliyê Meclîsa Gel daxuyaniyek çapemeniyê hate dayîn. Daxuyaniya çapemeniyê ji aliyê Berpirsiyarê Komîteya Têkiliyên derve Polat Bozan, Şaredarê Mexmûrê Ahmet Ozer û Endama Meclîsa Gel a Mexmûrê Nuran Sezgîn daxuyanî hate dayîn. Polat Bozan di axaftina xwe de diyar kir ku kordînasyona sêalî û dewleta Tirk ji bo tasfiyekirina PKK'ê weke gava yekem valakirin û tasfiyekirina Mexmûrê dibînin û wiha pêde çû; "Mexmûr wargeheke sivîl e û ji sedî 65'ê wargehê ji jin û zarokan pêk tê. Em ne PKK ne. PKK li çiya ye. Ji bo tasfiyekirina PKK destpêkê wargeh tasfiyekirin planeke şaş e. Em vê şermezar dikin." Bozan destnîşan kir ku ji bo vegera Tirkiyê hîn şert û merc ava nebûnê.

**Banga ji bo Hikûmeta Başûr**

Endama Meclîsa Gel a Mexmûrê Nuran Sezgîn balkişand ser komplo û dek û dolabên li hember wargehê tê meşandin û wiha pêde çû; "Daxwazên me yên vegerê diyar in. Heta ev bi cih neyên em venagerin Tirkiyê. Lê dîsa jî lîstikên li ser wargehê didomin. Em ji bo vê bangî rayedarên hikumeta Herêma Federal a Kurdistanê dikin ji bo nebin parçeyek van hîleyan û divê bi bîr û baweriya netewî tevbigerin."

Şaredarê Mexmûrê Ahmet Ozer jî balkişand ser rola Neteweyên Yekbûyî û diyar kir ku li hember van lîstikan divê NY hin tedbîran bigre û wiha pêde çû; "Em wargehek di bin banê Neteweyên Yekbûyî de ne û em penaberên siyasî ne. Neteweyên Yekbûyî divê mafên me biparêze û xwedî li penaberên Mexmûrê derkeve. Em di vê xalê de bangî NY dikin, bila NY xwedî li erka xwe derkeve û çavê xwe ji bêhuqûqiyan re negre." **MEXMÛR (DÎHA)**


Meclîsa Gel a Mexmûrê bi daxuyaniyekê dek û dolabên dewleta tirk ên li ser kampa wan deşîfre kirin û ji Hikûmeta Başûr ji hişyarî xwest.

## Li Ilisuyê ji nû ve kar dest pê kir

Sekreterê Teşebûsa Parastina Heskîfê Adnan Bayhan, diyar kir xebatên çêkiran înşeata Bendava Ilisuyê ku di meha çile ya 2009'an de hatibû sekinandin, dîsa dest pê kiriye û wiha got: "Lazim e dewlet dest ji projeya ku dê ziyana mezin ava bike berde û bi lez dawî li vê projeyê bîne."

Teşebûsa Parastina Heskîfê, der barê Bendava Ilisuyê de li avahiya xwe bi beşdariya endamên xwe civîna çapemeniyê pêk anî. Sekreterê Teşebûsa Parastina Heskîfê Adnan Bayhan, bi bîr xist ku di 7'ê tîrmeha 2009'an de hikûmetên Almanya, Avusturya û Swêdê, projeya Santrala Hidroelektrîk û Bendava Ilisuyê ku beriya niha temînata dayîna krêdiyê dabûn paşde vekişandibûn. Bayhan, diyar kir ku girêdayî vê biryarê 3 hep banqeyên Ewropayê jî dayîna krediyan betal kirine û wiha got: "Lê banqên Akbank û Garantîbanqê beşên xwe yên krêdiyê paşde nekişandibûn. Her wiha konsorsiyuma ji 6 şirketên Ewropayê û 4'ên tirk belav bibû. Ligel hikûmetên ewropî û banqên wan ji projeyê vegetiyan, lê mixabin Hikûmeta AKP'ê, xebatên çêkirina bendavê ku di sala 2009'an de hatibû sekinandin, di demên dawî de dîsa dan destpêkirin." Bayhan, anî ziman ku li gundên Ilisu û Karabayirê, di van demên dawî de makîneyên kar dixebitin. Bayhan, bi lêv kir ku li gorî gelekî raporên zanyarî yên ku hatine amadekirin, gelekî modelên hînd bi berhemtir ên enerjiyê û pêşketinê hene. **ÊLIH (DÎHA)**

## Darvekirina Fetahiyan kîna li dijî kurdan e

KNK'ê bi daxuyaniyekê darvekirina ciwanê kurd Îhsan Fetahiyan ku ji aliyê rejîma Îranê ve hate qetilkirin şermezar kir. Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku herî dawî rejîma Îranê ku bi navê Komara Îslamî hareket dike ciwanê kurd Îhsan Fetahiyan bi kîna li dijî gelê kurd û biryareke siyasî darve kiriye.

KNK'ê di daxuyaniyê de bal kişand ser pêkutiyên rejîma Îranê û wiha got: "Di sedsaleke ku mirovahî bi navê demokrasî, mafên mirovan, serdestiya hiqûq, peymanên gerdûnî û bi hêviyên jiyaneke bi rûmet tevdigere, mixabin gelê kurd hîn bi xewnên kabûsî û kuştinan dest bi jiyana rojane dike. Balkêş e ku, ev xewnên kabûsî bi destê dewletên xwedî rejîmên ku înkara gelan, siyasetên qirkirinê wek siyaset qebûl kirine pêk tê. Ev dewlet, dagirkerên xaka Kurdistanê ne û siyasetên red û înkarê, kiryarên derî exlaqî, derî hiqûqî, lîstikên komplowarî, yên li dijî gelê kurd dikine jiyanê."

KNK'ê di berdewamiya daxuyaniyê de wiha got: "Pêwist e baş were zanîn ku, di dîrokê de, kuştin û siyasetên komkujiyê ji bo dewletan, ji bo desthilatdaran nebûne ewlekarî, nebûne xelasî. Temenê dîktatorên herî despot jî, bi qasî zincîrên ji aliyê gelan ve hatine şikandin in. Aqûbeta wan jî, di dîrokê de baş tê xuyakirin. Dardekirina ciwanê kurd Ihsan Fetahiyan ji aliyê rejîma Îranê ve, dide xuyakirin ku hîn dîktator û faşîstên weke Sedam, Hîtler û Musolînî ji ser rûyê erdê xelas nebûne. Rejîma Îranê, bi awayekî bêşermî, gelek ciwanên kurd wek rehîn û bi tehîda kuştinê di destên xwe de digire."

KNK'ê raya giştî ya cîhanê û hêzên navneteweyî rexne kir û diyar kir ku li hemberî kujerî û kiryarên faşîzane ya dewleta Îranê û dardekerina ciwanê kurd Ihsan Fetahiyan bêdeng dimîne. Her wiha KNK'ê da zanîn ku ev jî dide xuyakirin ku, berjewendiyan, nirxên pîroz yên mirovahiyê têk birine û berdewam kir: "Pêwist e bê zanîn ku tu berjewendî, ji jiyana mirovan, ji azadî û nirxên mirovaniyê ne giringtir û binirxtir in. Gelê kurd, vê rûmetdariya giranbuha baş dizane û ji bo vê jî têkoşînê dike. KNK, hêzên dagirkerên xaka Kurdistanê ji hişyar dike ku, têkoşîna gelê kurd, bi kuştinan nikarin bitirsînin û paşde gav bidin avêtin. KNK, bang li hêzên Kurdistanê jî dike ku, dardekirina ciwanê kurd Ihsan Fetahiyan, dardekirina xwe, dardekirina rûmeta kurd, hebûna gelê kurd a çar parçeyan bibîne. Pêwist e hêzên Kurdistanî baş zanibin ku, rejîma Îranê, rejîma Tirkiyeyê û rejîma Sûriye ne dostên gelê kurd in û hebûna xwe di tunebûna gelê kurd de dibînin."

KNK'ê di dawiya daxuyaniya xwe de bang li gelê kurd kir û diyar kir ku bila gelê kurd bê deng nemîne û her wiha got dê gelê kurd rejîma Îranê bê bersiv nehêle. **BRUKSEL (ANF)**

## 'Dewletê em xapandin'

Di 2'ê tîrmeha 2004'ê de li Wanê bombeyek hate teqandin. Hate gotin ku bombe ji bo suîqasta li hemberî Walî Hîkmet Tan hatibû cihkirin. Di vê teqînê ligel welatiyê bi navê Velî Çoşkun 3 kesan jiyana xwe ji dest da. Dewletê sûc avêt ser PKK'ê. Piştî 6 salan Walî Tan got: 'Teqîn karê Ergenekonê ye.' Hevsera Velî Çoşkun, Habîba Çoşkun anî ziman ku ev 6 sal in dewlet wan dixapîne.

Piştî teqîna bombeya ku wekî suîqasta li hemberî Walî Hîkmet Tan hatibû lêvkirin, Wezîrê Karên Hundir ê demê Abdulkadîr Aksu û rayedarên din ên dewletê yekser PKK sûcdar kir. Gotin, 'bombe ji aliyê PKK'ê ve ji bo kuştina Walî Hîkmet Tan hatine teqandin'.

Têkildarî vê teqînê Faruk Taştan, Mehmet Kirdag, Ahmet Orek û Erkan Înan hatin girtin. Danişîna biryarê ya dadgehê ya ji bo doza van 4 kesên di girtîgeha Tîpa F a Wanê de tên hiştin di 25'ê adarê de pêk hat. Dadgehê ji bo Mehmet Kirdag, Faruk Taştan û Ahmet Orek bi tewambariya li ser navê PKK'ê pêkanîna sûc û endamtiya PKK'ê cezayê muebetê lê birî. Ji bo Erkan Înan jî bi tewambariya endamtiya PKK'ê 7 sal û 6 meh ceha hate birîn.

Lê piştî 6 salan Walî Hîkmet Tan anî ziman ku hewldana suîqastê ya li hemberî wî pêk hatî ji aliyê çeteya dewleta kûr Ergenekonê ve hatiye organîzekirin. Parêzer Dîncel Aslan bi mebesta têkiliya Hîzb-ut Tahrîr-Ergenekonê ya bi vê teqînê re serlêdana ji bo jinûve darizandinê pêk anî.

Hevsera Velî Çoşkunê ku di teqînê de jiyana xwe ji dest dabû de Habîba Çoşkun anî ziman ku bi salan e dewlet her wekî PKK'ê hevserê wê kuştiye agahiyan dide wan û wiha: 'Madem JÎTEM û Ergenekonê hevserê min qetilkiriye çima sûcî davêjin ser PKK'ê û me dixapînin.'

Habîba Çoşkun ku ev 6 sal in tevî 8 zarokên xwe şerê jiyanê dimeşîne, got ku piştî teqînê rayedarên dewletê gelek soz ji wan re dane. Lê tiştek ne kir. Hemû sozên xwe ji bîr kirin. Habîba Çoşkunê wiha got: "Huseyîn Çelîk hat got, 'em ê li ser navê dewletê zarokên te bidin xwendin'. Gotin, em ê miaşî bidin we. Her kesê soza deralîkirina mexdûriyeta me da. Yên ku ev soz dane û sozên xwe ji bîr kirine gelo wijdana wan niha rehet e?" **WAN**

## Ji bo zarokên dewlemend û polîsan cudaparêziya pozîtîf

Pirsgirêkên di pergala perwerdehiyê ya Tirkiyeyê de bi dawî nabin. Mînaka dawî ya vê cudakariya di navbera xwendekaran de li Wanê derket holê. Hate angaştin ku li dibistanên seretayî yên Husref Paşa, Salih Yildiz, Înonu û Şehît Yarbay xwendekarên malbatên wan dewlemend li 4 polên teknolojiya modern lê hatiye bicihkirin, tên perwerdekirin.

Hate daxuyandin ku li van polan 2 xwendekar di sirayekê de rûdinên, zangirt (kompîtûr), dataşop û materyalên din ên perwerdehiyê yên moder hene. Weliyan diyar kir ku dê têkildarî mijarê serî li dogzeriyê bidin û giliyê bikin. Weliyê xwendekarek diçe Dibistana Seretayî ya Înonu J. Ç. diyar kir ku li heman sinifê 6 polên taybet hene. Di dema qeydê de ev pol hatin avakirin. Weliyê bi navê N. A. jî anî ziman ku du zarokên wî diçin heman dibistanê û zarokên dewlemend û burokratan di nav zarokên din de perwerdehiyê nabînin. Ji dibistana Seretayî ya Husre Paşa jî daxuyand ku ev yek bi taybet tê kirin û ev tişt gotin: "Zarokên polîs, leşker û malbatên dewlemend dane heman polan." Mamosteyek ji heman dibistanê ku nexwest navê xwe bêje jî daxuyand ku 6 polên taybet hatine çêkirin û di van polan de zarokên dewlemend û polîsan tên perwerdekirin. **WAN (DÎHA)**

# Komîsyona Çareseriyê pêşniyar kir

## Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk di parlamentoya Tirkiyeyê de axivî û ji bo çareseriya pirsgirêka kurd pêşniyara komîsyonekê ji parlamentoyê kir. Hevserok Turk anî ziman ku gelê kurd hem şahid û hem mexdûrê qirkirin, zext û zordestiya dewletê ye

Hevserokê Partiya Civaka Demokratîk (DTP) Ahmet Turk di parlamentoyê de bangewaziyeke dîrokî pêk anî: "Îro em hene, sibê em ê nebin. Lê gelên me dê tim hebin, ji bo ku gelên me, me bi rêzdarî bi bîr bînin werin da vê pirsgirêkê çareser bikin." Turk ji bo çareseriya pirsgirêka kurd komîsyonek ji nûnerên partiyên ku di parlamentoyê de temsîliyeta wê heye pêşniyar kir. Turk ligel ku piştgirî da hewldana çareseriyê, ji ber ku hikûmet gavên şênber naavêje rexne kir. Turk got dijderketina hewldana çareseriya demokratîk û aştiyane israra şer û mirinê ye.

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk di danişîna taybet a Parlamentoya Tirkiyeyê ya ji ber 'hewldana çareseriya pirsgirêka kurd' de axivî û peyamên siyaseta kurd ên ji bo çareseriyê bi zimanekî zelal anîn vegotin.

### 'Gelê me gelek êş û jan jiyan e'

Turk di destpêka axaftina xwe de anî ziman ku ew nîqaşkirina pirsgirêka kurd a di bin banê parlamentoyê de bi girîngî dinirxînin û diyar kir ku hê jî navê vê pirsgirêkê lê nehatiye kirin. Turk wiha got: "Guman pê re nîn e ku ev pirsgirêk, pirsgirêka herî giran, girîng, herî zêde jan dayî û bûye sedemê windayiyan a Tirkiyeyê ye. Ji ber hindê em pirsgirêka herî dramatîk û her wiha herî mezin a Tirkiyeyê, pirsgirêka kurd diaxivin."

Turk derbirî ku pirsgirêka kurd ji ber şaşî û polîtîkayên tundîparêz ên dewletê hatiye asteke ku çareseriyê dixe zorê û got: "Bêguman aliyên vê pirsgirêkê yên têkildarî pergal û hevsenga hêzên navneteweyî jî hene. Ne mimkûn e ku pirsgirêka kurd ji hevsengên navneteweyî azade bê fikirin. Lê divê Tirkiye vê pirsgirêkê bi dînamîkên xwe yên navxweyî çareser bike." Turk di dewama van gotinên xwe de bal kişand ser polîtîkayên neo-lîberal û diyar kir ku polîtîkayên neo-lîberal bandoreke neyînî li ser jiyana civakî kiriye.

Turk di axaftina xwe de bi bîr xist ku Tirkiye di bin bandora hêzên navneteweyî de maye û di çarçoveya polîtîkayên kapîtalîzmê de çareseriya pirsgirêkan têkildarî pirsgirêka ewlehiyê di nirxîne û wiha pê de çû: "Noqteya girîng ew e ku kîjan nêzîkbûn xizmetî pergala navneteweyî dike? Hûnê bi înkar pirsgirêka kurd û cudahiyan an jî bi pêşxistina demokrasiya li welat, ewlekirina mafên demokratîk ên welatiyan xizmetî vê pergalê bikin?"

### Hem şahid in hem jî mexdûr

"Rastiya pirsgirêka kurd û şerê ku di encama vê pirsgirêkê de derketiye holê tim şaş hatiye nirxandin. Ev şaşî bi beşeke girîng a civakê jî dane qebûlkirin. Bi navê 'têkoşîna bi terorê re' raya giştî hatiye xapandin û bi vê yekê şerekî nepenî hatiye meşandin. Hiqûqa OHAl û rêveberiya zordestiyê wekî hincet hate nîşandan û qetilkirinên faîlên wan nediyar, işkence, înfaz, di bin çavan de windakirin, şewitandina gundan, binçavkirinên neheq û girtin hatin veşartin." Turk piştî kirinên dewletê yên li bakurê Kurdistanê rêzkirin wiha got: "Yên li vê herêmê dijîn, hem şahid û hem jî mexdûrên van kirinan in."

### Ji bo CHP'ê çi got?

Hevserokê DTP'ê Turk hevrebûna gelên tirk û kurd a dîrokî rêzkirin û bal kişand ser polîtîkayên înkar û îmhayê. Turk wiha got: "Serhildana Şêx Seîd, Agirî û Dêrsimê rast ne hatin nirxandin. Ji bo ku pergala têkçûyî ji nû ve bê sazkirin qetlîam û zordeyeke ku nayê lêvkirin pêk hat. Gelo bi vê rêbazê pirsgirêk çareser bû?" Turk bêyî ku nav bide gotinên Cîgirê Serokê Giştî yê CHP'ê Onur Oymen îşaret kirin û wiha dirêjî da gotinên xwe: "Yên ku îro jî vê hişmendiyê diparêzin hene. Divê ev yek bi zelalî bê dîtin. Ev hişmendî dê êdî nikaribe heman êş û janan bi gelê me bide jiyîn. Yên ku polîtîkayên înkar û îmhayê pêşniyarî hikûmetê dikin dê hesaba vê yekê bidin gel." Turk bi bîr xist kanê çemê Minzurê çawa xwîn herikî û tehrîba vê yekê ya di jêrhişa gel de anî ziman.

### 'PKK sebeb nîn e, encam e'

Turk polîtîkayên hikûmetê yên di çarçoveya tasfiyekirina PKK'ê de hatiye plankirin jî rexnekirin û got ku PKK ne sebeb, encama pirsgirêka kurd e. Turk propagandaya bi şêwayê 'biratiyê' têkirin bi bîr xist û gotinên Wezîrê Edaletê yê demê Mahmut Esat Bozkurt ên 'Tirk, tekane efendî û xwediyê vê welatî ne' ku di 21'ê îlona 1930'ê de kiribûn bi bîr xistin û got ji biratiya bi kurdan re ev hatiye fêmkirin. Ji Rapora Şerqê ya Îsmet Înonu ya 1935'ê, gotina Cemal Gursel a 'Kî ji we re bêje hûn kurd in, tifbikin rûyê wan' û gotina Wezîrê Karên Hundir ê demê Coşkun Kirca yên 'Li vî welatê yên ku ne tirk bin bitenê mafê wan ê bêdengiyê heye' ku di 1994'ê de kiribûn bi bîr xistin.

Turk piştî van gotinan pirseke dîrokî kir: "Yek derkeve bêje li ser rûyê dinyayê zimanekî bi navê tirkî nîn e, hûnê çi bikin? Heke hûn li hemberî vê neheqiyê dernekevin gelo hûnê rûmeta xwe bikaribin biparêzin? Bawerim, ev fikr jî ji bo hêrsbûna hinan ji we têr dike. Belê em vê trajediyê bi salan e dijîn."

### Ji polîtîkaya hikûmetê çi got?

Hevserok Turk zext û zordariya li ser gelê kurd tê meşandin bi mînakan rêz kir û gotina xwe bi ser donamdina operasyon de bir û çi encam hatine girtin, pirsî. Turk xwedîlêderketina gelê kurd a li hewldanên çareserî û aştiyê bi bîr xist û wiha got: "Ez di wê baweriyê de me heke em bi awayekî rast hevrû paşroja xwe nebin, em ê di pêşerojê de baweriyê bi hev neyînin." Turk di dewama axaftina xwe de anî ziman ku gelên kurd û tirk pirsgirêkê bi hev re najîn û got ku gelê kurd dizane ku polîtîkayên înkar û asîmîlasyonê ji aliyê gelê tirk ve nayê parastin.

Turk derbirî ku bi hinceta 'ewlehî nîn e' razemenî li Kurdistanê pêk nehatiye û got ku di demê pevçûn neyî de jî dewletê razemenî li Kurdistanê pêk neaniye. Turk anî ziman ku tekane riya çareseriyê sazkirina pergaleke demokratîk e û wiha got: "Xwe îfadekirina nasname, ziman welat parçe nake. Berovajî vê yekê dê yekgirtinê xurt bike. Divê tu kes cudahiya nasnameyan wekî bingehê parçebûnê nebîne û wisa nîşan nede."

Turk di dewama gotinên xwe de gotin anî ser 'hewldana çareseriya pirsgirêka kurd' û got, 'ji ber ku ji rêbazên paşverû qutbûn çênebûye pêşketin çênabe.' Turk wiha got: "Hişmendiya siyasî ya ku mafê perwerdehiya zikmakî wekî parçebûna welat dinirxîne, mimkûn e ku bêje me dest ji polîtîkayên asîmîlasyonê berda ye? Hikûmet divê xwe zelal bike û cidî nêzî vê pirsgirêkê bibe. Em dibêjin êdî bes e. Em êdî helwestên ku vê nakokiyê deralî dikin dixwazin bibînin."

### 'Pêvajo hatiye xitimandin'

Turk got ku pirsgirêka kurd bi zimanê tirkî re nîn e û bûna zimanê yê fermî yê dewletê ne pirsgirêk e û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em wekî Partiya Civaka Demokratîk ji destpêkê heta niha piştgiriyê didin vê pêvejoyê. Ligel ku tu projeyên şênber ên hikûmetê nîn in jî me hêviya xwe winda nekiriye.

Hevserokê DTP'ê Turk derbirî ku israra Hikûmetê ya ji bo operasyonan pêvajo aniye asta xitimînê û wiha pê de çû: "Baweriya me bi vê yekê heye: Heke helwesteke cidî ya ji bo çareseriyê bê nîşandan, çek dê di nava 3 mehan de ji rojeva Tirkiyeyê derbikevin. Di vê pirsgirêkê de dibe ku yên kezeba wan neşewitî, tiştek li wan nebûyî rehet tevbigerin! Lê mafê tu kesî nîn e ku pirtir êş û janan bi me bidin jiyîn. Ji niha şûnde ev mafê tu kesî nabe."

Tirk bang kir ku siyaset pirtir vî barî bigire ser xwe û pêşniyarên ji bo çareseriyê rêzkirin: "Ji bo çareseriyeke demokratîk pêk bê, pêşniyara me ew e ku ji nûnerên partiyên di parlamentoyê de temsîliyeta wan heye komîsyonek bê avakirin... Komîsyona ku dê bê avakirin bila dîroka hatiye berovajîkirin sererast bike û rastiyan derbixe holê. Heqîqetan vekole û li kû çi xeletî hatiye kirin derbixe holê. Komîsyona ku dê bê avakirin bila danûstandina wan a bi rewşenbîran û re jî hebe."

### Banga dîrokî

Turk di dawiya axaftina xwe de got ku Tirkiye heke pirsgirêka kurd bi rêbazên demokratîk û aştiyane çareser bike dê bile welatê serkêş ê Rojhilata Navîn. Divê baş bê zanîn ku yên dibêjin em ê pirsgirêka kurd bi rêbazên leşkerî çareser bikim xizmetî neçareseriyê dike. Baweriya me ya ji bo aştiyê heye. Bi saya mafdarî û meşrûbûna xwe em ê serkeftî bin. Banga me ji bo muxalefet û îktîdarê ew e ku bi cisaret nêzî vê pirsgirêkê bibin û dest ji polîtîkayên xapandinê berdin. Li hemberî dîrokê cîhgirtineke bi rûmet ji bo her siyasetmedarî nabe qismet. Werin em tev vê rûmetê parvebikin û ji bo zarokên xwe pêşerojeke aram û aştiyane diyarî bikin. Îro em hene, sibê em ê nebin. Lê gelên me dê tin hebin. Em ê yan bi minet yan jî bi lanetê bêne bibîranîn. Werin em tev berpirsiyariyê bigirin ser xwe. Van pirsgirêkan çareser bikin ku nifşên pêş me bi rêzdarî bi bîr bînin." **ENQERE**

### Ji axaftina Turk xalên bingehîn

- Pirsgirêka kurd ji ber ku aliyên wê yên têkildarî geşedanên navneteweyî hene, bêyî ku ev alî neyên dîtin çareser nabe. Lê divê çareserî bi dînamîkên navxweyî re pêk bê.
- Ji bo çareseriya pirsgirêka kurd komîsyonek ji nûnerên partiyên ku di parlamentoyê de temsîliyeta wan heyî pêk tê bila bê sazkirin.
- Ez di wê baweriyê de me heke em bi awayekî rast hevrû paşeroja xwe nebin, em ê di pêşerojê de baweriyê bi hev neynin.
- Hiqûqa OHAL û rêveberiya zordestiyê wekî hincet hate nîşandan û qetilkirinên faîlên wan nediyar, îşkence, înfaz, di bin çavan de windakirin, şewitandina gundan, binçavkirinên neheq û girtin hatin veşartin. Yên li vê herêmê dijîn, hem şahid û hem jî mexdûrên van kirinan in."
- Baweriya me bi vê yekê heye: Heke helwesteke cidî ya ji bo çareseriyê bê nîşandan, çek dê di nava 3 mehan de ji rojeva Tirkiyeyê derbikevin.



## Ji pakêta hikûmetê tasfiye û xapandin derket

Wezîrê Karên Hundir Beşîr Atalay di axaftina têkildarî hewldana çareseriya pirsgirêka kurd kirî de, gavên avêtine ji parlamenteran re vegotin. Atalay diyar kir ku Makeqanûn bersivê nade daxwazên civakê û hewceyî bi makezgonek azadîxwaz, pir rengî û demokratîk heye.

Atalay diyar kir ku du hedefên hewldanê hene û wiha axivî: "Yek dawîkirina terorê û ya din jî demokratîk bûne. Wekî heta niha têkoşîna bi terorê hatiye dayîn, ji niha pêve jî dê bê dayîn. Di bin gelek nexweşiyên siyasî û sosyo-ekonomîk de bêdadî heye. Tirkiye di encama kuştinên kiryar nediyar û işkenceyên pêk hatîn de bû wekî welatek bi kuştinan tê bîranîn. Di dema me de gavên demokratîkbûnê hatin avêtin."

Atalay diyar kir ku van gavan têrê nabînin û ev tişt gtin. "Ji bo standarda demokrasî û mafên mirovan a gerdûnî bê girtin, di dema kin, navîn û dirêj de tedbîr dê bên girtin. Ev ji bo tevahiya welat e. Wiha bibe dê serbikeve. Slogana hewildanê 'Ji bo herkesê zêdetir azadî' ye. Ji bo herkesî zêdetir mafên bingehîn, azadî û demokrasî wezîfeya Tirkiyeyê ye. Di dema kin de tiştên em bikin zêdetir bi guherandina qanûna ye. Li ser vê mijarê hevgiriya saziyên dewletê ya hevpar berdewam dike. Me mijara darizandina zarokên li dadgehên mezinan tên darizandin anî Meclisê. Ev li pêşiya tedbîrên me ye. Rêziknameya girtiyan a bi zimanê zikmakî bi malbatên xwe re biaxivin kete m eriyetê. Dersên hilbijartî yên kurdî yên li zanîngehan û vekirina enstîtuyan dê bibe gavek girîng a vê pêvajoyê. Televîzyonê taybet dê bikaribin 24 seatan bi zimanek din weşanê bikin. Di qadên cemawerî û olî de ji bo welatiyên me zimanê xwe bikaribin biaxivin tedbîr dê bên girtin."

Atalay daxuyand ku ji bo hemwelatî bikaribin wekî kesên wekhev li mafên xwe bigerin divê mekanîzma bên avakirin û yên heyîn bên bi hêz kirin. Atalay wiha pêde çû: "Komîsyonek bi cudakariyê re têbikoşe ya serbixe dê bê avakirin."

Atalay wiha got: "Em ê çarçoveya qanûna partiyên siyasî berfireh bikin û astengiyên li pêşiya propagandaya siyasî bên rakirin. Propagandaya bi welatiyan re a bi zimanek din dê bi rihetî bê kirin. Ev guherandin dê li gorî PMME'yê bên kirin. Ev ne paketek bi dawî bûye. Di nav pêvajoyê de li gorî hewceyiyan dê gavên nû bên avêtin. Standarda demokrasiyê dê bê bilind kirin. Gelê me vê Makezgonê heq nake. Lazim e makeqanûnek beşdarkar, pir rengî, azadîxwaz û demokratîk bê amade kirin. Me gelek caran got ku 3 xalên pêşiyê bi tu awayî nayên guherandin. Yek dewlet, zimanê fermî, al û sirûda neteweyî derveyî van guherandinan e." Atalay diyar kir ku çi piştgiriya bê kirin ji bo wan girîng e û bendewariya wan jî ev e. **ENQERE (DÎHA)**

# The Economîst: Polîtîka Tirkiyeyê ya kurd bi rîsk e

**Kovara navdar a The Economîst polîtîka hikûmetê ya li ser qaşo 'çareseriya pirsgirêka kurd' analîz dike û dibêje heke çareserî ji esas ve pêk neyê rîskên mezin li pêşiya Tirkiyeyê ne**

Komavar The Economîst li ser polîtîka hikûmeta AKP'ê ya ji bo 'çareseriya pirsgirêka kurd' nirxandineke berfireh kir. Gelek cihan pesnê hewldanê da û gelek cihan jî bal kişand ser xetereyên polîtîkayê. Bi taybetî ji ber helwesta AKP'ê ya li hemberî partiyên muxaflefê derdixe pêş. Kovara The Economîst a Îngilistanê îdia dike ku ji ber vê helwesta heyî ya AKP'ê hikûmet û PKK ji bo lihevkirinê hê pir nêzî hev in.

Di analîza hejmara dawî ya kovara The Economist de tê îdiakirin ku ku hikûmeta AKP'ê ligel hemû dijîtî û êrîşên partiyên muxalefet ên Tirkiyeyê paşve gav neavêt û ji bo 'çareseriya pirsgirêka kurd' bi israr e. Li gor îdiayê hikûmeta tirk guhê xwe li rexneyên 'AKP' îxanetê dike' re xitimand û bi wêrek amadekariyên gavavêtina hewldanên der barê mijarê de dike. Tê gotin ku ji ber vê jî ji her demê pirtir Tirkiye û serhildêrên kurd ji bo aştiyê nêzî hev in. Kovar xalên ku qaşo ji bo çareseriyê tên derxistin jî wiha aşkera dike: Qanûnên ku hikûmet dixwaze derxe armanca wan ev e pêşî li betaliyê bigire û nehêle ciwanên kurd radîkal bifikirin û neçin beşdarî PKK'ê nebin.

**Vegereke dramatîk**

Kovara The Economîst guhertina hikûmeta AKP'ê û serdana Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Ahmet Davutoglu ya Hewlêrê wek vegereke dramatîk destnîşan dike û wiha pê de diçe: 'Davutoglu di serdana başûrê Kurdistanê de diyar kir ku ew dê balyozxaneyekê li Hewlêrê vekin. Ev ji polîtîkayên dijberiya kurdan vegereke dramatîk e.' The Economîst balê dikişîne ser helwesta generalên tirk ên demek berê jî. Dide zanîn ku generalên tirk ji vir demek berê jî ji bo başûrê Kurdistanê dagir bikin gef li kurdan dixwar. Kovar vedibêje ku daketina gerîlayên PKK'ê ya ji Qendîlê ji bo Tirkiyeyê mijareke girîng e û cih dide bertekên ku di vê der barê de derketine holê jî.

**Rîska veqetandinê heye**

Ji bo xetere û rîskên ku pêşerojê derkevin holê jî vê nirxandina Parêzer Sezgîn Tanrikulu dide: "Mezinbûna veqetandina hestiyar a nav kurdan û tirkan dê bi xwe re veqetandina cografîk jî bîne". Kovar di berdewama vê nirxandinê de wiha pê de diçe: "Bi rastî jî polîtîka hikûmetê gelek rîsk di nav xwe de dihewîne. Heke çareserî di demeke kin de wek ku tê xwestin nebe û PKK li bajaran dest bi şerê çekdarî bike dê pêvajoyeke nû derkeve holê. Generalên tirk jî dê vê ji bo xwe wek hincetekê nîşan bidin û hewl bidin ku careke din desthilatiya xwe ya li ser polîtîkayê hakim bikin.

Lê kovar ligel vê nirxandinê di nav generalên tirk de helwesta Fermandarê Giştî yê Tirkiyeyê Orgeneral Îlker Başbug wek helwesteke nerm û nêzî AKP'ê destnîşan dike. Vê jî ji bo AKP'ê wek şansekî derdixe pêş û dibêje pozîsyona artêşê bo derbeyê musaît nîn e.

**Polîtîka tasfiyeyê**

The Economîst di hewldanên çareseriya pirsgirêka kurd de cih dide pozîsyona Serokê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî. Tê diyarkirin ku Ocalan piştgirî dide çareseriyê. Heke Ocalan bixwaze fermandarên gerîla gotina wî dikin û di çarçoveya xwesteka wî de çareseriyê dê qebûl bikin. Ev jî derfetek e. Balkêş e ku kovar di hemberî vê de jî hewldanên AKP'ê yên plana tasfiyeyê yên AKP'ê li dû hev rêz dike. Ji bo vê balê dikişîne ser xebatên 'efûyê', daxuyaniya Serokdewletê Sûriyeyê Beşar Esad a li ser gerîlayên kurd yên başûrojavayê Kurdistanê û 'şandina pêşengên gerîla yên Norveç û Awusturyayê."

**Çareserî û şer**

Di dawiyê de jî The Economîst aşkera dike ku heke pirsgirêka kurd neyê çareserkirin û PKK bê tasfiyekirin jî pirsgirêka kurd çareser nabe. Heta di demeke kin de şer dest pê bike û dê Tirkiye ber bi xetereyên nû ve biçe. Di rewşeke wisan de baweriya nav kurdan û tirkan ji binî ve ji holê dê rabe. Ev jî wek neçareseriya herî mezin tê nîşandan û dixwaze ji niha ve hesabên vê bên kirin. LONDON




## Rêxistineke nû ya Îranê

Rêxistina muxalefetê ya Îranê ragihand ku wan ji bo hêza Muhafizên Şoreşê xurtir bikin rêxistineke îstîxbaratê ya nû hatiye damerandin.

Serokê Konseya Berxwedana Neteweyî ya Îranê ku navenda wî li Parisê Rajavî, destnîşan kir ku dê vê rêxistina nû jî baskekê Muxafizên Şoreşê be û dê tenê hesab bidin Serokê Olî Ayetullah Alî Xamaney.

Rajavî di daxuyaniya xwe ya li Brukselê de derbirî ku dê rêxistina nû 7 daîre û hên hêzên ewlehiyê bigihîne hev û dê Wezareta Îstîxbaratê jî vala derbixe. Serkonsolosê Îranê yê Brukselê îdia red kirin. TEHRAN

## Amerîka mizgeftên Îranê digire

Hikûmeta Amerîkayê, 4 mizgeft û balexaniyek ku girêdayî Weqfa Muslumanan e desteser dike.

Dozgeran ji bo ku avahiya û mal û milkên Weqfa Alavî ji aliyê hikûmetê ve bên desteserkirin, serî li dadgehê da. Tê îdiakirin ku weqf, bi riya şîrketekê paravan bi milyonan pere ji bankaya dewletê ya Îranê ya bi navê Melî re şandiye.

Dozger dixwazin ku mizgeftên weqfê yên li New York, Maryland, Teksas û Californiayê, erdên li Virginayê û balexaniya li New Yorkê jî di nav de hemû mal û milkên weqfê bên desteserkirin.

Li Amerîkayê rewşeke nadir e ku hikûmet, îbadetxaneyan desteser dike. WASHINGTON

## Rûsyayê çekfiroş hişyar kirin

Fermandariya Giştî ya Rûsyayê diyar kir ku ew zanin kî çek didin Gurcistanê û Tirkiye jî di nav de ew hişyar kirin.

Li ser mijarê Fermandarê Giştî yê Rûsyayê Nîkolay Makarov got ku wan bi xebatên vehûr diyar kirine ku kîjan welat çekan didin Gurcistanê.

Makarov da zanîn ku Gurcistanê lez daye çekdariyê. Li gor Makarov welatên ku lîsteya wan di destê Rûsyayê de ne di bin destan de çekên cihêreng şandine Gurcistanê. Fermandarê Giştî yê Rûsyayê aşkera kir ku çekên Amerîkayê bi destê sêyemîn sewqê Gurcistanê dikin. Di demên dawî de çapemeniya rûs aşkera dike ku zêdetir Ukrayna û Israîl çekan didin Gurcistanê.

Di demên borî de di çapemeniya Rûsyayê de hatibû diyarkirin ku Tirkiyeyê di nav 5 salên dawî de bi kêmanî di buhayê 45 milyon dolarî de çek û muhîmat daye Gurcistanê. Her wiha leşkerên Gurcistanê perwerde kiriye. Di nav angaştan de angaşta herî balkêş a li ser Tirkiyeyê ye. Tê gotin ku Tirkiyeyê mayinên ku bi xwe çêdike 70 wesayîtên zirxî yên bi navê 'Ejder' daye Gurcistanê. MOSKOW (ANF)

## Bîranîn



Cemal Yildiz 1967 Melazgîr 1992 Erzûrum

*Li çiyayê Bagokê*
*şêrê bi deng î tu*
*li çiyayê Zagros*
*bi ceng î tu*
*li çiyayê Botan*
*pilingê bi şeng î tu*
*li çiyayê*
*Agirî wolqana*
*beng î tu*

**Li ser navê malbata wî xwîşka wî Perîzade Karaca**

## Faşîzaniya Sûriyeyê kûr dibe

KCK-Rojava diyar kir ku li girtîgehên Sûriyeyê her diçe zext û zorên faşîzane yên li henber girtiyên kurd û malbatên wan zêde dike û nahêle malbatên girtiyan bi zarokên xwe re hevdîtinan bikin.

Malbatên girtiyên girtîgeha Edra yên kurd ji bo serdana girtiyan bikin li ber dergehê girtîgehê kom bûn. Lê rêveberiya girtîgehê nehişt malbat girtiyan bibînin. Ji ber ku girtî ji roja 30'ê meha cotmeha 2009'an ve ketine greveke birçîbûnê û îro derbasî roja 15'an dibin. Malbatan dan xuyakirin ku ew ditirsin gelek îşkence li ser girtiyan pêk bên û ji ber vê jî nahêlin hevdîtin bi wan re bikin.

Hat gotin ku girtiyên (PYD) derbasî greva birçîbûnê ya vekirî bûn û heke ew birçîbûnê bidomînin pêkan e ku rêveberiya girtîgehê daxwaziyên wan bi cih bîne. Wek serdana malbatan, têkilî danîna bi derve re, ji bo têkiliyên nav girtiyên hevalên xwe ya bêhnvedanên li hewşê, dayîna radio û TV'ê, dadgehkirineka adîl..hwd.



Hemû girtiyên fikr û ramanê li girtîgeha Edra di rewşeke nebaş de dijîn. Dora 300 kurd li vê girtîgehê hene. Hinek ji wan hatine dadgehkirin û hinek din hîn li benda dadgehkirinê ne.

Tê zanîn, ku girtiyên kurd ên (PYD û PKK) li girtîgeha Seydnaya sala borî di meha cotmehê de ketin grevek birçîbûnê de ku 17 rojan dom kiribû. Bi vê greva birçîbûnê ya li Edra dibe cara 2'yemîn ku endamên PYD li Sûriyeyê bi giştî derbasî greveke birçîbûnê dibin. Rêxistina Civaka Rojavayê Kurdistanê bang li hikûmeta Sûriyeyê kir û berpisyariya her ziyanek li ser girtiyan dixe histên hêzên ewlekariya Sûriyeyê û ji wan daxwaziya azadkirina hemî girtiyên nêrînê, rêvekirina li ber nivîsandina 'Destûrek' nû, ku rêzê ji azadiyê û mafên hemî gelên Sûriyê re digire bê amadekirin û qebûlkirin. ŞAM

## Li dijî ISI' yê êrîşa întiharî

Hat aşkerakirin ku di êrîşa ku saziya îstîxbarata artêşa Pakistanê ya li balarê Peşaverê de saziya îstîxbarata artêşa Pakistanê hedef hat girtin.

Polîsan ragihand ku di êrîşê de herî kêm 8 kesan jiyana xwe ji dest dane. Şahidên bûyerê dibêjin ku di encama êrîşê de avahiya îstîxbarata artêşê ISI'yê bi tevahî hilweşiya.

Êrîşe duyemîn jî, li bajarokê Banuyê li bakurrojavayê Pakistanê qewimî. Di vê êrîşê de 8 peywirdarên ewlehiyê hatin girtin. Piştî ku artêşê li dijî herêma Veziristan a Başûr a ku di bin kontrola Talîbanê de ye, operasyonek li dar xist, li hin herêmên Pakistanê teqîn qewimîn û bi sedan kesî jiyana xwe ji dest dan. ÎSLAMABAD

www.arsivakurdi.org

**NALÎN DÎCLE**

ZAGROS (ANF)

# Mînaka hesabpirsîna ji xiyanetê: Fatma Bozdemîr

JÎTEM'ê ew weke ajan şand. Ji jiyana gerîla bandor bû, li xwe mikur hat û tevlî refên gerîla bû. Li çiyayê Zagrosê di êrişek hewayî de jiyana xwe ji dest da.

Raya giştî Fatma Bozdemir (Çavrê Kindil) bi 'Lîstika Jehrê' nas kir. Çavrê, ji aliyê JÎTEM'ê ve bi mebesta ku jehrê bibe Herêmên Parastina Medyayê hatibû şandin. Li Herêmên Parastina Medya li xwe mikur tê bi jiyan û rêhevaltiya gerîla bandor dibe. Piştre jî biryara tevlîbûna refên gerîla dide. Dema ku gerîlatî li Zagrosan dikir, di êrişeke hewayî de jiyana xwe ji dest da. Çavrê, li Mêrdinê di malbatekê xizan de çavê xwe li cihanê vedike. Ji ber şerê li Kurdistanê malbat koçî Stenbolê dike. Çavrê, ji ber xizaniya malbatê mecbûrî karkirinê dibe, bêyî ku dibistana seretayî xilas bike di terikîne. Dema ku di kargeha tekstîlê de dixebite, bêyî ku haya wê jê hebe dikeve defika JÎTM'ê. Bi gefan wê mecbûr dikin ku ajantiyê qebûl bike. Tê perwerdekirin û ji bo jehrê bibe Herêmên Parastina Medyayê tê şandin. Çavrê, li Herêmên Parastina Medyayê dikeve ferqa lîstaka ku di nav de ye. Piştî ku dikeve nava lêpirsînê biryara li xwe mikurhatinê dide. Di demeke kin de jî biryara tevlibûna refên gerîla dide.



## Şopdara lehengan

Çavrê, bi lehengî û berxwediyani ya di dîroka têkoşîna azadiya kurd jî gelek bandor dibe. Lêpirsîna xwe ya kesayetî li hember berxwadaniya Mazlum Dogan, Zîlan, Sema Yûce û Berîtan dike û van kesayetan ji xwe re wek mînak digre.

Çavrê, di rojaneya xwe de egidî û berxwedaniya van kesayetan û lêpirsina xwe ya li hember van kesayetan di rojaneyek xwe de bi vî awayî tîne ziman: "Divê em bibine rêhevalê Serokatî, Mazlûm û Zîlan. Belê hûn, ew çi wêrekiyeke mezine ku xwe bombeyan parçekirin, xwe di agiran de helandin û bi tilîliyan xwe ji latan avêtin!

## Fermandara mezin Zîlan!

Ma çawa dilekî te hebû ku te bedena xwe bi bombeyan teqand. Ew vîna te, ew xwesteka te, ew kesayetiya te tê vê wateyê ku bi gotinan nayê vegotin.

Rêheval Sema!

Keça agir! Te laşê xwe veguhezte ariyê. Ev dil, wêrekî û vînê dixwaze. Tu bûyî sembola van hemûyan. Te xwe ji ariyên xwe afirand. Gelek xwedawendên ku nayên ji bîr kirin hene. Tu jî bûyî yek ji van xwedewendên azad. Çi bextewariyeke mezin e ku hûn bi rûmetî azad bûn û li dinê bêmirin bûn.

Fikra kesayet û çalakiyên we bi xwe jî, hemû laşê min dilerizîne. Her ku we difikirim kîna min mezintir dibe û ji wê sazûman serdest û qirêj a emperyalîstan re lanetan dibarînim. Û ez êşeke mezin jî dikşînim, çima em nikarin fermanên fermandarên xwe yên mezin pêk bînin?"

Lêgerînên wê

Çavrê, xwedî lêgerînek mizin e, lêgerînên xwe di rojaneyek xwe de bi vî awayî rave dike: "Mîna pêlên deryayek, her dem dixwazim pêl bi pêl ber bi bêdawîtiyê ve herim. Û fena rivîna agirekî bizotî, dixwazim dîlan bigirim. Carna difikirim, gelo ez ê bikaribim mîna hevala Sema xwe ji ariyên xwe ji nû ve biafrînim? Gelo ez ê bikaribim mîna Xwedawend Zîlan bibim xwedî jiyaneke mezin? Di rastiyê de wan di tevahiya jiyana min de daxwaz û xeyalên min in." Ew hêvî û xeyalên xwe bi evîndariya lehengên mina Bêrîtan mezin dike. Ji bo xwe van kesayetan mînak digre. Ji bo ku bibe rêhevala van qehremanan hewildayîn û têkoşînek behempa wek erkê xwe yê esasî dizane.

Çavrê wiha dibêje: "Bihîstina dengê Bêrîtan ji şikêran, di dilê jinê de berxwedaniyê dinexşîne. Dixwazim xwe bigihînim şehîdên me yên ku vê axê bi xwînê av dane. Ez jî dixwazim bi xwîna xwe axê av bidim û mina her hevalek şehîd û li ser vê axê wekî gulek şîn bibim.

Ev banga min qêrîn bi qêrîn e, gelo wê rojek li ser van axên pîroz bê bihîstin? Wê rêhevalên min ên şehîd min bi pejirinin nava xwe? Ez ê bikaribim bibime xwedî jiyanek bi wate. Hevalno ji min nexeyîdin, tenê daxwaza min ew e ruhê xwe bi jiyana we re bikim yek."

# Evîndara çiyayê Zagrosê

**Ev banga min qêrîn bi qêrîn e, gelo wê rojek li ser van axên pîroz bê bihîstin? Wê rêhevalên min ên şehîd min bi pejirinin nava xwe? Ez ê bikaribim bibime xwedî jiyanek bi wate. Hevalno ji min nexeyîdin, tenê daxwaza min ew e rihê xwe bi jiyana we re bikim yek**

*Min ew li nav yekîneyek gerîlayên jin bi cil û bergên gerîla li çiyayê Zagros dît. Qasî serpêhatiya wê ya li nav JÎTEM'ê, serpêhatiya wê ya çiyayê Zagros jî ji me re balkêş hat. Bi hevpeyvînekê serpêhatiya wê ya çiyayên Zagros fêr bibin. Ev hevpeyvîn çend roj beriya ku Çavrê jiyana xwe ji dest bide hatibû amadekirin.*

***✓ Hûn bi mebesta ajantiyê hatibûn şandin. Çi li ser we bandor kir ku hûn dev ji karên ajantî berdin û biryara tevlîbûna refên gerîla bi din?***

Di nav gerîla de hevaltiyek pir bi rûmet heye. Nirxên ku didin hev, girêdana wan ya bi hev re gelek bandor li min dike. Her gerîlayek ji cihekî, ji heremekê hatiye; lê di şer de ji bo hevalê xwe canê xwe feda dike. Ji bo hevalê wî/wê şehîd ne be xwe dike çeper. Tişta ku hişt ez biryara tevlibûna gerîla bidin, di gêrîla de rûmeta ku didin hev e. Di nav PKK'ê mirov hîs dike ku wek însan dîjî. Nirxekî manewî heye û ev nirxdayîn ne li ser madiyetê ye. Vê rastiyê li ser min bandor kir. Di nav gerîla de dema ku mirov bi hinek rastiyan re rû bi rû tê bandornebûn pir gengaz nîn e.

Di nav gerîla de rûmeta ku min dît hişt ku bikevin ferqa van lîstikên qirêj. Ketim zanistiya ku ev tevger, ji bo azadiya gelê kurd û azadiya jina kurd e. Niha dizanim ku dijminên kurdan dixwazin kurdan li hember kurdan bi kar binîn û bi vî awayî tasfiye bikin. Li Herêmên Parastina Medyayê ketim vê ferqê ku dewleta tirk ka çend li ser jin û ciwanên kurd lîstikên qirêj lîstine. Ketina ferqa vê rastiyê; ne tenê biryarbûnek xurt li gel min daye avakirin, hesteke tolgirtinê jî da ye çêkirin.

Armanc û hedefa min; dijminê ku di xwest bi rûmeta gelê kurd, jin û keça kurd bilîze, li çiyayên azad heta dawî bi şer û têkoşîna xwe, poşman bikim. Dixwazim di kesayeta xwe de piştrast bikim ku her çiqas bi keçeke kurd bilîzin jî wê nekaribîn cewherê keç û jina kurd xirab bikin. Ji hestên wan yê wijdanî tenê jî ma be wê rojek ji rojan tola xwe ji wan bigire. Ez ê jî di jiyana xwe de vê rastiyê raxim ber çavan. Ez ê vê jî bi guhertin û veguhetina ku di kesayeta xwe de bidin çêkirin ez ê nîşan bidim.

***✓ Niha hûn li Çiyayê Zagrosê gerîlatiyê dikin. Hûn dikarin hinek behsa serpêhatiya xwe ya Zagrosan bikin?***

Jiyana li çiyayê Zagrosê wekî xewn û xeyalekê xweş e. Her ku van bedewiyan dijîm her wekî ku di nav xeyalekê de bim. Bedewiyên jiyana gerîla jî wek xeyalekê jî min re tên. Di gerîla de manewiyeteke mirovahî û xwezayî, bûnek mirovahî heye.

Pir stran li ser hevaltî û xweşikbûna çiyayê Zagrosê hatine çêkirin. Her deverek çiyayê Zagrosê ji bo me xwedî wateyeke giranbûha ye. Gelek rêhevalên me li Zagrosê şehît ketine. Her hevalek bi Zagrosê re girêdanbûnek xwe yê pir mezin heye. Rêhevatiya van çiyan qasî pîrozbûn û bilindahiya Zagrosan mezin e. Li Zagrosan ez bi vê rastiyê re jî rû bi rû hatim ku gêrîlayek ji bo rêhevalê wî şehît ne be xwe dike sîper.

***✓ Em bijimêrin xweşikbûnên çiyayên Zagrosê; dema ku bêjin Çarçela, yan jî Cilo çi tê bîra mirov?***

Dîtina van bedewiyan hestek gelek bedew e. Ya ku van çiyan jî xweş dikin û van xweşikbûnan bi me didin hîskirin jiyana me ye. Jiyaneke pir xwezayî, jiyaneke ku hezkirin tê de heye. Di van çiyan de evîneke mirovahî heye. Em vê rastî yê jî di çiyayê Zagrosê de dijîn. Zagros, rûmeteke pir mezin di kesayeta mirov de dide çêkirin.

***✓ Çiyayê Zagrosê gelek asê ne, hûn bi van çiyayayên asê re yekbûnek çawan didin çêkerin?***

Dema em hevalê keç bi hev re dimeşin ji min re pir cuda tê. Hêvî û baweriyek mezin dide min. Di nav civakê de ne dihiştin ku jin derkeve devê deriyê malê, lê di çiyan de bi hev re bi yekitiyek mezin dikarin beranberî hemû tundiya xwezayê bijîn, dikarin şer bikin. Di nav gerîlayên jin de yekitiyeyek pir xurt heye, girêdanbûneke pir mezin heye. Di şer de; di çalekiyêkê de xwestekeke pir mezin heye. Gêrîlayên jin gelek caran çakakiyên xweser pêktînin. Di çiyan de vînek mezin jî li hember şert û mercên xwezayê nîşan didin. Ya ku herî min bandor dike jî hebûna rihê fedaî ye jinê ye. Di nav gerîla de xala herî esasî jî jiyana hevpar e. Di nava gerîlayên jin de hevkarî û parvekirineke pir mezin heye. Mînak; di nav me de hinek heval çekên giran yên weke BKC, B7 radikin. Ne tenê ew hevala ku çek aîdê wê ye radike. Di meşekê de bi dorê her hevalek wê çekê hildigire.

Tekiliyên navbera têkiliyên keçên civakê û tekiliyên navbera keçên gerîla de cudahiyek mezin heye. Di nav geralayên jin de fikrek pêşketî heye. Mezinahiya çiyan hiştiye ku dil, ruh û mejiyê jinê fireh bibe û hin bêhtir bi xwe bawer bibe. Jiyana ku keçên civakê dijîn tenê di bin zilm û îşkencê de jiyane. Divê ku her keçeke ciwan were van çiyan bibîne, van çiyan bijî, hîs bike û fêm bike. Keç dikarin werin di van çiyan de û vînek pir xurt nîşan bidin û fikreke pir pêşketî di xwe de bidin avakirin.

Bila her dayik jî bi welatparêziyeke pir mezin destekeke xurt bide keçan. Ji ber ku heta niha dayikên kurd êşên pir mezin kişandine, ji bo ku zarokên wan jî van êşan nejîn erkek mezin dikeve ser milê dayikan. Azadî bê bedel nabe; ger pêwîst bike mirov zarokên xwe jî bedel bide. Ji xwe kurd jî ji bo azadiyê bedel didin. Ji bo pêşeroja zarokan, ji bo azadiya jin û dayikan e.



*Fatma Bozdemîr piştî biryara tevlibûnê da ji xwe ew qas bawer bû ku çeka herî giran B 7 hilgirt û bi wê dest bi têkoşînê kir.*

## Hewl dide bibe şagirta Rêberê xwe

Di her gotinek xwe de behsa bedewiyên çiyayê Zagrosê, Çarçela, Cilo dikir. Ronahiya çavên wê evîndariya wê ya ji Zagrosan re ji her tiştî baştir vedigot. Di awirên wê yên dijwar de diyar bû ku wê qasî evndariya xwe ya ji Zagrosan re wê li hember dijminên kurdan jî kin û nefret mezin kiribû.

Çavrê di dema xwatirxwestinê de ji me re wiha got: "Dema ku dîmenên min di lîstika jehrê de hatine weşandin, dizanim ku gelê me, malbata min, bi hebûna min sernizmî jiya lê ez dizanim ku bi vê biryara min a rast jî, wê serbilind û şanazî bin."

Çavrê, bi felsefe û bîdoziya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bandor dibe. Her ku di vê felsefeyê de kûr dibe hezkirina wê ya ji çiyan û gerîla re mezin dibe. Hemû rojaneyên xwe jî ji Rêberê Gelê Kurd re dinivîsîne. Di rûpelek rojaneya xwe wiha nivîsandiye:

"Zanayê mezin Rêber Apo; wekî jinekê naskirina te, hezkirina te û di baxçeyê te yê gulan de bûyîna qevdek gul hesteke gelek bedew e. Min xwest ku vê lênûskê bi hestên xwe yên ku min ji bo we mezin kiriye vebikim. Ji ber ku di dilê min de tu yê vê kêliyê û her dem, bengîtiyeke veşartî ya di herî pêş de bî. Lê ez vê bengîtiya xwe ji kesî re nabêjim. Ji ber ku Rêberê min ez keseka wisa me ku hatime gule berdim hewldanên te yê azadî, lê niha min berê guleyan daye ew sazûmana dijmin a kirêt. Ji ber vê yekê ye ku êdî berxwedaniya te, hêrsa te, sekna te û tehlîlên te bandor li min dike. Ez ji ber van tiştên ku min dîtiye ketime nava lêpirsîneke wijdanî. Lê Serokê min, ev lêpirsîna ku ez dikim, kîn û nefretek têdixe dilê min û pê re jî dilê min bi azweriya tolgirtinê dadigire. Ji ber vê dixwazim ew qas bi pêş bikevim, da ku bikaribim tola xwe bigirim. Û ez ê bi ser bikevim. Ez ê xwe bigihînim asta jina azad û kesayetiya milîtaniya azad. Û ez ê li derdora Îmraliyê bibim şewqeke ku hundir ronî bike.

Evîn û dildariya herî mezin tu yî. Tu yê ku te min ji koletiyê, ji nexweşikbûnê rizgar kirî ye. Ez soz didim te!

Ey mirovê berz!

Dil û mejiyê min, ez ji te hez dikim.

Ez ê biryar û îdiaya xwe ya girêdana bi te û têkoşînê îspat bikim û ez ê bi ser bikevim."

### Xeyala Bedew: Ez Apocî me

Çavrê, gav bi gav nepeniyên Zagros fêr dibe û bi vî awayî xeyalên xwe mezin dike. Di rojaneyekî xwe de xeyalê xwe bi van rêzikan tîne ziman:

## "Xeyalên min!"

Heyfa min li ew mirovên ku hêvî û xeyalên xwe winda kirine tê. Xeyal, mirovan ber bi lêgerîneke bêdawîn ve dibe. Xwegihandina xeyalan ew e ku hemû qirêjiyan hetanî atomên wê parçekirin e. Ger ku xeyalên te azadiyê bixwazin, rihê te jî wê dixwaze. Ku te hêviyê hîs kir, tu yê digel her tiştî bi îdia serî bilind û bi israr bî. Ancax tu dê bikaribî wê demê bi ser bikevî. Vaye di wê demê de min hewl da, min şer kir û min bi dest xist.

Xeyal ew hesteke ku mirovan li ser piyan dihêle. Her mirov xwedî xeyalek e. Ya min jî heye. Di hundire min de ye û bi zehmet e. Tolgirtin! Û ji dijmin re; 'Binêrin we nikaribû min bikuştana, ez bi hêz im, ez li vir im û ez hatime ji we hesab pirsînê' gotin. Û bengîtiya xwe ji şehîdan, Serokatî re bi jiyana xwe nîşandayîn. Bûyîna leşkereka baş, milîtanbûyîn û bi serbilindî gotin û bilêvkirina 'EZ APOCÎ ME' "

# Şewba berazan an fermana amerîkiyan

**Şewbên dertên ceribandin û planên sermayedariyê ne. Li hemberî xerabkirina sermayedariyê divê bîrdoziya KCK'ê ya ku sazûmaneke demokratîk, azad û ekolojîk ji bo mirovahiyê pêşî dibîne pêwîstbûna xwe derdixe ber çav**

HESEN HUSEYÎN DENÎZ*



Di hundirê salekê de şewbek li parzemînekê peyde bû û roj bi roj û bi lezgînî li cîhanê belav bû. Derketina cihê şewbê cihekî gelekî balkêş e. Meksîka û Amerîka. Tê zanîn ku Meksîka ji gelek aliyan ve wekî sergoyê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ye. Amerîkayê li ser vê xakê gelek ceribandinên nukleerî pêk aniye. Çi di bin xaka vê derê de, çi li ser xaka vê derê nayê zanîn bê çiqas tehrîbata nukleerî heye û dikare çi bandoran li ser xweza, mirov û ajalên li vî welatî bike. Her çiqasî ceribandinên nukleerî di bin erdê de çêbikin jî, kesek nikare garantiya vê bide ku ji van ceribandinan tiştek derneketiye ser rûyê erdê, yan tev li hewa û ava wê derê nebûye. Bi vê sedemê dema dibêjin ku şewba berazan ango şewba xenzîr destpêkê li Amerîka û Meksîka peyde bûye, yekser ev tê bîra mirov. Gelo ev şewb encama kîjan ceribandina nukleerî ye?

Şewbek bê sedem ji ber xwe ve dernakeve. Ger ji feqîrî, qirêjî û bêdermaniyê derdikeve, divîbû di dema çermesoran de û piştre di dema qirkirina çermesoran de şewb derketibaya. Çima li hêviyê ma ku di qirnê bîstûyekê de derkeve. Di demeke wiha de ku her kes xwedî av, sabûn, destav û têgiha paqijiyê ye, mirov dikeve nava şik û gumanan ku şewbek ji qirêjîbûnê rû bide.

**Ev pêla şewba sêyemîn e**

Dibêjin ji ber ku nîşaneyên şewbê dişibin şewba li berazan peyde dibe, ev nav lê kirine. Yanî çi gunehê berazan tê de nîn e. Demekê li Brîtanya û wan derdoran jî gotin nesaxiya `golikên har` derketiye. Rabûn bi sedan, bi hezaran golik qir kirin. Dîsa di heman demê de gotin `şewba çûkan` hatiye. Bi milyonan mirîşk qir kirin. Dilê min herî zêde jî bi mirîşkên me yên li gundên Kurdistanê ma. Dayîkên debara mala xwe li ser du sê mirîşk û çend lib hêkên ji wana werin dikirin, dema mirîşka wan ji wan dihat tendin wekî serê zaroka wan were jêkirin wiha bi wana zor dihat û rondik tije navbera mijankên wan dibûn. Dizanîbûn ku bi çûna wan mirîşkan, êdî wê hêk neketina selikê û nebiribana dikanê, bi kîloyek şekir an bi qalibek sabûn nikarîbana biguhertana. Êdî debara mala xwe dê bi çi bikrana? Yan ku zarok dema sibehê berê xwe bidana dibistanê, dê çawa li ser zikê birçî çûbana? Çi sedem e nayê zanîn, şewba mirîşkan jî û nesaxiya golikên har jî çawa hatin wiha çûn û niha li şûna wana şewba berazan rû da der. Heta salekê dê ev jî biçe. Yên bimrin wê bimrin û yên bifilitin dê li bendeyî agahiya nûçeyeke din a şewbeke din bin. Ka bê vê carê ji ser kîjan xaka Amerîka nizanim di kîjan dîrokê de ceribandinek nukleerî lê kiriye de, wê nexweşiyek çawa derkeve pêşberî mirovan. Dibe ku derketina van nexweşî û şewban jî encameke planên sermayedariyê yê danûstendinê be. Çawa ku sermayedarî dema mal di dest de kom dibe û kesên vî malî bikirin hindik dimînin û di wê demê de ji bo daxwaz zêde bibe bi tonan ji wî malî dirijînin behrê yan jî dişewitînin û bi vî awayî careke din buhayê wê bilind dikin, xwedêgravî gelo ev jî ne encama planeke wiha be? Bi derketina nexweşiyeke wiha dermanfiroş, nexweşxane, bijîşk, çapemenî û gelek sektorên li derdora van dizîvirin çiqase kar dikin gelo?

Gotineke kurdî heye; ji bo kesên mafnenas û rêzê ji tu pîvanê re nagirin, dibêje; `Ew derpiyê diya xwe jî nabore!` Ev peyv ji bo sermayedarî û serkêşê sermayedariyê sazûmana Amerîkayê pir di cih de ye ku mirov bi kar bîne. Ji bo berjewendiya xwe û zêdetir kar bike, sermayedarî bi rastî jî derpiyê diya xwe jî nabore. Wê jê daxîne û karê xwe bike. Ew qasî bêtixûb di warê bêexlaqiyê de rizandinekê dijî.

**Gelo şewb karê sermayedariyê ye**

Ji bo wê guman heye ku van nexweşî û şewbên her salê bi awayekî rû didin encama kar, xebat, ceribandin û planên sermayedariyê bin. Sermayedarî bi derxistina van virûsan him mirovahiyê dixe nava tirs û xovê, him bala mirovahiyê ji ser pirsgirêkên jiyanî dizîvirîne ser aliyên din û him jî wana hewceyê xwe dike.

Bi kevirekî gelek çûkan dikuje û gunehê wê jî carekê dixwe stûyê golikan, carekê mirîşkan û niha jî yê berazan.

Feqîrên berazan nikarin xwe li ser vê bêbextiyê biparêzin jî. Lê ew jî dizanin ku sermayedariyê, ne tenê jiyana me, tevahiya xwezaya me tije virûs kiriye û jiyan li şînatî, ajal û mirovan herimandiye. Ji bo vê divê mirovahî li jiyana ekolojîk xwedî derkeve û li hemberî xerabkirina sermayedariyê, xwezayeke şîn, pak û bê virûs biafirîne. Di vî bingehî de bîrdoziya Komelên Civaka Kurdistanê ya ku sazûmaneke demokratîk, azad û ekolojîk ji bo mirovahiyê pêşî dibîne jiyanîbûn û pêwîstbûna xwe zêdetir derdixe ber çav.

**Navenda Lêkolînên Stratejîk a Kurdistanê*

# Girîb, kiştişa meyîsan ra vejya?

EHMEDÊ BIRA

Heme raşteyî, gumanî-şupeyî ra vejyayê û dê bivejyê. Çîyê ke ez vani zî, sav a mi ya. Ma weş bizanê ke, merdimî qetîyen bi xozayî nêşenê. Her waxtî de xoza xo newe kerdo û keno. Newekerdiş, semedê xirabekerdişê merdiman ra yeno. Xoza zî qabê ke denga dinyayî bîyaro ca, xover dano. Çimkî merdimî qabê çixara xo nêvindenê, heme çîyan xirabe kenê. No zî, beno semedê xirabebîyişê xozayî. Meseleyî ez bi ney nûmûneyan tikey bo zî zelal bikî. Citkarî qabê ke mereyî toxim nêwê, dermanê jahrinî vera qula mereyan danê û zaf mereyî mirenê. Citkarî nêzanê ke, ê merêyî kerman an zî çîyanê ke zirar danê erdî wenê. Nêzanê ke, eg citkarî maran nêkişê se, marî mereyan weno. Kişta bînî ra, nêzanê ke ê merêyî qabê ke ax va bigo û vîtamînê ci zengîn bibo, zaf feyde dano.

Nimûneyêna. Ney vîra mekê. Cayê ke mere zaf o, mar çîno. Yanê, ez ney vajî, cayê ke marî zaf amayê kiştiş de mereyî zaf ê. Çimkî mar dijminê mereyan o û înan çi ca de vîneno wenê. No zî ekolojîya dinyayî, ano ca.

Bi kilmeya ney nimûneyan; qertel, baz û ze înan; tewranê maran, ewrişan, tewranê mereyan û zbn. wenê. Leylek; maran, mereyan, kermanê awî û zbn. wenê. Mirîçikî; kermanê daran, ê heywanan û meyisanê ke, zirar danê merdiman wenê. Kergî paqijeya çopa hewşa xo û kuçeyanê dewan de, kijnik, kekan, moncileyan, eşkijan-spîyan û kerm û kermanê ke, ma bi çimanê xo zor vînenê, wenê. Ma şikyenê, ney nûmûneyan zaf hîra bikê.

Ma ney bizanê ke, vînîbîyayişê yew heywanî, zêdbîyişê yew heywanê yo. Ney ra, ez bi rehetey şikyeni vajî ke, dermankerdişanê şehran, girîba xenzîran û yên bînan vet. Eg dermankerdişê şehran nêbo se, nêweşîyanê ze girîbî nêvejyenê.

Gora mi, meyisanê sîya, vayî de çi mîkrob esto weno. Çimkî, cayê ke meyisî eysenê heme cayê qilêrinî de yê. Yanê meyisî bi kîlomîtroyan boya ey pîseyî oncenê û şinê ey mîkrobanê ey wenê, û veranêdanê ke mîkrob vila bibo. Çira wenê? Wenê ke, wa xoza qilêrin nêbo. Wenê ke, xo mird bikê. Wenê ke ekolojî cade bivindero. Yanê meyisanê sîya çopwerd ê vayî yê. No zî zaf muhîm o. Eg meyisî, ê mîqroban mewê se, mîkrobî vayîra reseno merdiman û merdiman nêweş kenê û kişenê.

Ez bêrî esasê mesele sero. Bi des serano ke, heme cayanê dinyayî de, bi dermanê meyis û ajalanê ke zirar danê ma, ma kişenê. Ma bi ney, nêzanê ke, ma xo bi xo kişenê.

Ez vani ke, qabê nêweşeya girîba xenzîrî û yên bînan, kokîra hal bibo, gere heme dinya fek dermankerdişê meyisan ra verado.

Kişta bînî ra zî, ez bala şima boncî kiştêna. Dermananê kîmyasalî, tabaxa Ozonî qul keno. Hela balafirî-teyareyî dijminê Ozonî yê. Çimkî roj, gaza ke ê vejenê nêşeno bimijo, yanê parzûnî ra bido ravêrayiş. Kişta bînî ra zî, dewletî sîlehanê kîmyasalan erzenê merdiman û cayanê xalî yo. No zî, dano eysayiş ke, dewletî merdimanê xo kişeno.

Qabê ke nêweşîyanê wina kokî ra bêro wedarnayişî ra, dinya mecbûro ke meyîsan nekişo. Eg bala şima onto se, meyîsê verî çînê. Meyîsê newe ê rengo reng ê vejyayê. Nê meyisê newe nêşenê hintayê meyîsanê verî, vayî paqij bikerê.

Qabê dinyaya weş û otantîk, heme kes mecbûrê ke xozayî bipawê û weş biewnê ey ke, wa merdî nêweş nêbê û nêmrê.



Ez vani ke, qabê nêweşeya girîba xenzîrî û yên bînan, kokîra hal bibo, gere heme dinya fek dermankerdişê meyisan ra verado

# AKP'ye û Omer El Beşîr

LERZAN JANDIL

Her çiqas ke mesela hal bîye, yanê Omer El Beşîr nêşî Tirkîye kî, ez na derheq de nivisnayene wuncîya kî muhîm vînena. Zanîno, binê îqtîdarê Omer El Beşîrî de Darfur de 200 hezarî ra zêdêrî însanî amê kîştene. 2,5 mîlîyonî însanan welatê xo terk kerd. Çar mîlîyonan ra zêdêrî însanî bê hetkarîye nêşîkînê cuyena xo dewam bikerê. Darfur de dewî amê rijnayene, vêşnayene. Teror, îşkence û tecavuz bî karê cancavîdan. Coka kî Omer El Beşîr bi hukumê mahkemeyî seba qetlîamê Darfurî sucdar amê dîyene.

Serekwezîrê Tirkîye Erdogan derheqê qetlîamê Darfurî de û seba ke Omer El Beşîrî biparezno, kaleka tayê çîyan de bi kilmîye vano: "Muslumanî qetlîam nêkenê."

Gelo na alince çiqas rast a, mantiqkî ya?

Eke na alince rast mebo, ahlaq yan kî wijdan kotîyê na alince de ro? Gelo eke merdim bivajo: "Cuhudî spekulator ê!"

Yan kî bivajo: "Mesîhî dizd ê!" Yan kî bivajo: "Budîstî zurêker ê!" nê alincî çiqas rast ê? Ahlaq û wijdan kotîyê nê alincan û vatişan de ro?

Lê seba Serekwezîrê Tirkîye Erdoganî her hal de nê çî muhîmî nîyê. Seba Erdoganî muhîm o wo, ke ganî Erdogan o keso ke bi hukumê yew mahkemeyî amo sucdar kerdene, biparezno. Çike o kes musluman o, çike o kes Omer El Beşîr o. Na mesela de Erdogan tenya nîyo. Serekkomar Abdulah Gul kî qerarê mahkemeyî re rest anceno û vano: "Şima karê xo de nîya bidêrê!"

Merdim na mesela de kamcî het ra nîya dano, wa bidêro, çîyê zelal vîneno:

Hem Serekwezîr Erdoganî, hem kî Serekkomar Gulî demokrasî nêhemelno, wayirê Prînsîpanê taybetîyan nîyê. Seba înan demokrasî hêya, lê tenya seba înan.

Prînsîpî hêya, la belê tenya seba înan.

Seba nê herdimîn serekan eke domanê Fîlîstînî bêrê kîştene, ganî merdim duşt de bivejîyo, re înan wayir bivejîyo. Çira? Çike ey Musluman ê û hetê dewleta Cuhudan ra ênê kîştene.

Lê eke domanê şarêde bînî bêrê kîştene, sey domananê Darfurî, nê herdimîn serekî duştê naye de nêvejînê. Çike keso ke. dewleta ke ênê sucdarkerdene Musluman ê. Eke domanê Fîlîstînî ênê kîştene prînsîpê nê herdimîn serekan est ê. Lê eke domanê Kurdan ênê kîştene, prînsîpê nê herdimîn serekan çîn ê.

Eke duştê Mîloşevîç de qerar êno girewtene, nê herdimîn serekî çepilan danê piro. Lê eke duştê Beşîrî de qerar êno girewtene, nê herdimîn serekî nê qerarî nêşinasnenê. Lê zanîno, ters pîyê vergî yo. Eke Ewropa, yan kî Amerîka vat "vinde!" o taw Şêrê ma beno pising.

Seba roşnavîranê ke derheqê demokrasî û AKP de, derheqê demokratbîyena Erdoganî de huna sereyê xo zelal nîyo, meselaya Omer El Beşîrî, sewdaya AKP'ye û El Beşîrî ganî dersêde girse bo. Nê roşnavîrî rêyê Îran û Tirkîye, Ahmedînejad û serekanê Tirkîye bişanê têver, rind kenê!

www.arsivakurd.org

# ‘Reşê Şevê’
## di mîhrîcana navneteweyî de ye

Lîstika “Reşê Şevê” ku ji hêla Destar Theatre ve tê ser dikê, di Mîhrîcana Şanoya Enqereyê ya Navneteweyî de derdikeve pêşberî temaşevanan.

Mîhrîcana Şanoya Enqereyê ya Navneteweyî bo lîstikên kurd jî cih da bernameya xwe û di mîhrîcanê de lîstika şanoyê ya bi navê “Reşê Şevê” derdixe ser dikê. Lîstik di 15’ê mijdarê roja yekşemê Salona Şanoya Çar Demsal a Şaredariya Yenimahalleyê tê ber temaşevanan. Di lîstika “Reşê Şevê” de ji hêla sîstemê ve dorpêçkirina jinê, bûyerên ku di cîhana serdestiya zilam de dijî, nakokiya jinê ya bi xwe re û bi sîstemê re tê nîşandayîn. Lehenga lîstikê ji hêla şanoger Berfîn Zenderlioglu ve tê bercestekirin.

Destar Theatre yekem car di şanoyeke kurdî de sernivîsa tirkî bi kar anî û dê li pêşandeya Enqereyê jî ev pêkanîn bidome. Derhênerê lîstikê Mîrza Metîn daxuyaniyek da û got, ew di pêşandeyên bajarên mezin de plan dikin ku sernivîsê bidomînin û armanca wan e ku şanoya kurdî bigihînin girseyên fireh.

Destar Theater wek şanoya kurdî yekem car e ku ji Wezareta Çandê ya Tirkiyeyê peredanî digire û xebatên xwe yên şanoya “Cerb” didomîne. **STENBOL**

# Gelo qiyamet di 2012’yê de ye

**Li gorî salnameya Maya, dawiya sala 2012’an dawiya salnameyan e û destpêka qonaxeke nû ye û li gorî hinekan jî, nirxandina Maya weke roja qiyametê tê dîtin**

Spekulasyonên li ser 2012’an her ku diçe zêdetir dibin û bêhtir pişta xwe didin salnameya çanda Maya. Salnameya Gelê Maya, ji aliyê gelek dezgehên zanistî ve, ji ber rastiya xwe ya li ser pîvan û encamên demsalan û atronomiyê, cidî tê dîtin. Li gorî salnameya Çanda Maya, di 21’ê çileya 2012’ê de dawiya salnameyan e. Ev dîtin ji du aliyan ve tê şirovekirin:

Dawiya cîhanê ye, an jî destpêka demeke nû ye.

Kovara Vetenskap (ilm, zanyarî) li Swêdê, li ser bingeha zaniyariyên ji dezgeha NASA li Amerîka û kesên pispor, pirs kir cihê nîqaşê û tevayê dîtinan di hejmara nû ya kovarê de belav kir.



**Çanda Maya**

Gelek diyalektên wan hebûn. Ew xwedî heman bawerî û çandek dewlemend bûn. Wan li Amerîka navendî, di navbera welatên îro, Meksîko, El Slavador, Honduras û Guatemelayê jiyana xwe didomandin. Kolandinên arkeolojîk şopa wana dibin salên 1500 berî ji dayikbûna Mesîh.

**Îdiaya salnameyê**

Salnameya Maya, piştî çêbûna Mesîh hatiye nivîsîn. Pîvanên wê, yên li ser demsalan, meh û rojên salê, her wisa li ser ilmê asîmanî ji aliyê zaniyariyê ve ji ber rastiya xwe pir cidî tê girtin. Li gorî salnameya Maya, dawiya sala 2012’an dawiya salnameyan e û destpêka qonaxeke nû ye. Li gorî hinekan, nirxandina Maya weke roja qiyametê tê dîtin û li gorî dîtinên din, ji bo însanetiyê destpêka qonaxeke nû ye.

Li gorî pîvanan, di roja 21’ê çileya 2012’ê de, roj û kakêşîn dikevin heman xetê.


Îdiayeke din wisa ye: Wê rojê, dikare roj, di nav xwe de, teqînan pêk bîne û agir û germiya wê bandoreke mezin li cîhanê bike. Sîstema enerjiyê bi carekê re hilweşîne û pêşketina heye rawestîne. Însaniyetiyê li sedsalên berê vegerîne.

Teqîneke wisa di 13’ê adara 1989’an de pêk hatibû û Quebeka Kanadayê 6 milyon kes demeke dirêj bê elektrîk hiştibû. Di 2002-2003’an de jî teqînên din pêk hatibûn û bajarê Malmoya Swêdê di reşiyê de hiştibûn.

Îdiayeke din heye ku qala gerokstêrka Niburu dike. Îdiayên li ser hebûna stêrka winda Neburu ji dema Sumeran tê. Stêrk, wê rojê dê di ber sînorê cîhanê re derbas bibe. Derbasbûneke wisa bandoreke mezin dê li jiyana sosyal û xwezayê bike û mirovan perîşan bike.

Kovara Vetenskap dibêje ku, pîvan û zaniyariyên zanistî aşkere nîşan didin ku, pêwîst nake mirov bitirsin. Ji ber ku sîstema parastina cîhanê baş dixebite. Cîhan ji jor ve, bi riya meydana manyetîk, atmosfer û jenosferê tê parastin. Xeterên ku ji asîman tên, heta ku digihijin cîhanê bi saya tebeqe û meydanê bêxeter dibin. Li asîman gelek satelîtên çavdêr hene. **WASHINGTON**

# SPASÎ



HACI YUCE
(Hamza Dêrik)

ERDAL YILDIZOZ
(Bager Andok)

*Di wan rojên me yên xemgîn de ên ku kul û êşên me parve kirin û û li şîna şehîdê gelê kurd xwedî derketin û em bi tenê nehiştin, em spasiya xwe di serî de pêşkêşî ji gelê Amedê û Mêrsînê, rêxistina DTP’a Amedê û navçeyên wê, rêxistina DTP’a Mêrsînê û navçeyên wê û hemû şaredar û parlamenterên me yên DTP’ê û hemû sazî û nas dost û xizmên xwe re pêşkêş dikin.*
*Em dibêjin bila serê gelê kurd sax be...*

**Malbata Yildizoz û Malbata Yuce**

# Fîlmê winda yê Chaplin hat dîtin



Mirovekî li malpera ku firotina tiştan lê dibe bi 3 sterlînî qutiyek kirî, lê ji qutiyê fîlmê Charli Chaplin ku nayê zanîn derket.

Fîlmê hat dîtin di qîmeta 40 hezar sterlîn de ye ku fîlmekî windabûyî yê Charlie Chaplin e.

Kesê qutî kirîbû kesek bi navê Morace Park e. Park dema di malperê de li tiştan dinêrî di nav tiştên kevnare de qutiyeke ku li ser "fîlmê kevn" hatiye nivîsîn bala wî kişandiye. Wî di cih de ew qutî bi 3,20 sterlînî kiriye. Lê ji qutiyê fîlmê Charlie Chaplin derketiye û ew bi vê yekê şaş bûye. Park, berdewamiya mijarê wisa tîne ziman: "Tê de 'Charlie Chaplin in Zepped' dinivîsand. Ez di Google de lê geriyam lê li ser fîlm min tu agahî bi dest nexist, lewma zêdetir ez ketim nav meraqê. Li ser vê yekê min ji John Dyer ku endamê berê yê Lijneya Belavkirina Cureyan e. Bi vî awayî min fêm kir ku tiştê min kiriye çiqas bi qîmet e."

Di fîlmê hatiye dîtin de fîlmê 7 deqîqeyî ye û bi 35 mm hatiye kişandin; naveroka wê jî li ser êrîşa Zeplinê ye. Fîlmê ku tê texmînkirin li ser propagandaya Şerê Cîhanê yê 1'emîn e, balê dikişîne ser bombebarana hewayî ya Almanyayê ya li hemberî Îngilistanê. **AMED**

www.arsivakurd.org




# Xal bi Xal

Hevalên delal, hûn dikarin xalan bigihînin hev. Em bibînin ka dê di encamê de çi derkeve.



# Nêçîra Peyvan


Mirîşk
Dîk
Vekirin
Diyarkirin
~~Newal~~
Komar
Niştiman
Mehabad
Gurdilan
Dêrîn

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| G | L | R | M | X | Z | K | V | N | N |
| V | E | K | I | R | I | N | I | M | A |
| K | N | N | Y | P | V | ş | Y | K | L |
| ş | V | N | R | K | T | L | M | O | I |
| î | T | W | N | I | N | M | Y | M | D |
| R | K | F | M | E | R | î | K | A | R |
| I | J | A | X | R | W | î | R | R | U |
| M | N | J | L | C | D | A | R | ê | G |
| D | A | B | A | H | E | M | L | C | D |
| D | I | Y | A | R | K | I | R | I | N |

# MATEMATÎK



Hevalên jîr, hûn dizanin dê li cihên vala kîjan reqem bên?




# Boyax



adarjiyan@mynet.com
ADAR JIYAN



## Demsal



Hevalên delal,

Wekî ku hûn jî dizanin sal dizivire. Demsal, meh, hefte û roj derbas dibin. Hewa û avhewa diguherin.

Sal ji çar demsalên cuda pêk tê. Demsal jî wekî mirovan tewre bi tere ne. Û her yek ji wan bi gelek taybetiyên xwe, me li xwe diheyirînin.

Her çar demsal jî bi rengîniya xwe, bi fêkiyên xwe, bi bedewiyên yên cure bi cure der û dora me dixemilînin.

Her demsalek awayekî xwezayê bi me dide hisandin.

Her demsalek rûyekî cîhanê yê rengîn bi me dide nasîn.



Her demsalek, aliyekî jiyanê yê cuda bi me dide tehmandin.

Her mirovek li gorî xwe ji demsalekê hez dike. Hin jê ji biharê, hin jê ji havînê, hin jê ji payîzê û hin jê jî ji zivisatanê hez dikin.

Gelek kes ji biharê (bihara rengîn) hez dikin.Belê ez bi xwe tu cudayetiyê naxim navbera wan.. Ligel hejmara kesên ku ji biharê hez dikin zêde be jî (wekî Melayê Meşhûr) ez ji hemû demsalan hez dikim. Û hezkirina min jî ne bê sedem e.

Me çima got wekî Melayê Meşhûr?

Dibêjin: "Ji Melayê Meşhûr dipirsin û jê re dibêjin: 'Seyda, tu ji havînê hez dikî an ji zivistanê?' Mela di cih de bersiveke pir balkêş dide û dibêje wan: 'Ma cihê ku bihar lê hebe, ez ê çibkim ji havîn û zivistanê (ango ez ji herduyan jî hez nakim).'"



İcar hevalên hêja,

Dizanim hûn ê bipirsin û bibêjin: "Gelo çima tu ji her çar demsalên salê hez dikî?"

Bêguman gelek sedemên ku ez ji her çar demsalên salê hez dikim hene. Belê divê ez çend sedemên girîng li jêr rêz bikim ku hûn jî heq bidin min.

Ez ji biharê hez dikim. Ku bihar tê, jiyan dest pê dike.Hemû heyîn û heyberên jîndar ji xewa mirinê hişyar dibin. Dar û ber hişîn dibin. Ger û tevger zêde dibin Der û dor dixemile.



Dengê şalûl û bilbilan, bêhna gul û beybûnan meriv mest û sermest dikin. Cîhan û jiyan tev geş dibin.

Ez ji havînê hez dikim. Ku havîn tê, dar û ber, hewr û debr dikemilin.

Roj dirêj dibin. Fêkî û sebze distewin. Kanî û rûbar diherikin. Betlane dest pê dike. Geşt û vehesîn geş dibin. Di keleqija nava rojê de ligel alastina besteniya ser kovikan û avjenî xweş dibe. Bin siya darê hênik dibe.

Ez ji payîzê hez dikim. Ku payîz tê, dibistan det pê dikin. Fêkî tên berhevkirin. Pelên daran diweşin. Dinya hênik dibe. Baran dibare. Ber û bereket zêde dibe. Govend û dilan li dar dikevin. Xew xweş dibe. Amadehiya zivistanê tê kirin.

Ez ji zivistanê hez dikim. Ku zivistan tê, berf wekî kayê dibare. Erd û asîman spî dibin. Guliyên daran dixemilin. Listika gokên berfê û şemitandina şematokên ber xaniyan xweş dibe.

Li ber têhna sobeyê qemirandina nanê tenûrê û xwarina berû û kartolên biraştî pir xweş dibe. Şev dirêj dibin. Bi dengê vîzevîza bayê kur re, xew li mirov giran dibe. Xewn û xeyal geş dibin.

Bi min her demsal li gorî xwe xweş e.



www.arsivakurdi.org

# Virhewle

MEYMAN B. STÊRK

Piştî şerê cihane yê yekemîn, komara nû ew gelên kevnare û rengên herêma Serhedê çêdikirin; hinek qir dikirin, yên mayîn jî sirgûn dikirin. Yên hê jî mabûn jî di nav dêrisê navçe û bajarên herêmê de, di navbera dijîtiya hatibû afirandin de bi zehmetiyeke mezin debar dibûn. Piraniya gelê rûs û ermenî; hemû avahî, erd, zevî û hebûna xwe bêxwedî hiştibûn, çûbûn. Komara nû wê demê li cihên vala mabûn ecem û tirkên azerbaycan û nexçiwanî dianîn tije dikir. Bi vî awayî ev avahî, erd, zevî, dikan û sûkên bêxwedî mabûn; bê bedel, bê ked diketin destê ecem û xerîban. Eceman jî piştî xwe bicih kirin, çav dibeliqandin derdorê bajarê Qersê. Roj bi roj dest didane ser zevî û erdên welatiyekî. Hêza dewletê dabûn pişta xwe; navbera xwe û wezîfedarên komarê yên fermî û leşkerî baş dikirin û her diçû hebûna xwe fireh dikirin.

Di dawiya 1940'î de, demeke biharê gundiyên navçeya Dîgorê mîna her sal, dixwestin tevli pez û dewarên xwe, xwe bigihînin zozanên xwe yên  tapê Qersê. Niha li ser wî tapê şîn kulîlk bi heft rengan bişkuvîbûn, kereng dirêj bûbûn, sipingê şîr dabû û giha gihîştibû. Zozanê mîna bukeke nû siwar dibe xwe xemilandibû. Hawirdor di nava rengên hêşinahiyê de bûbû ceneteke derewîn, mîna hemû zozanên welêt, di nav rindbûn û biyanîbûna xwe de dirijiya.

Gundi, ev fikir di hişê wan de, di nav coşeke mezin de, li ser pişta hesp, ker, ga û firxûnan berve zozanê dimeşiyan. Pez û dewarên wan jî di bin kargeriya şivan û gavanan de bi çêre diherikîn. Kalekala berx û karan tevli dengê zarokan mîna newayekî pirdeng hawirdor de li ser gir û baniyan belav dibû, wekî pêl li şkeftan diket, vedigeriya. Di nav yaxên çiyayê kûr û çend girên bilind de hê jî teqalên berfê hebûn.

Di serê koça zozanê de li ser du firxûnan muxtarê gund, kal-pîr û çend mirovên sereke rê hildidan. Di nav wan de jî gundiyekî navê wî Sertîf, lê jê re digotin 'Virhewle' jî rûniştibû; mîna gelek deman dîsa henek dikirin, çîrok digotin. Bi wî dengê xwe yî ziz ve diaxivî û metelok digotin. Dixwest hemû balê bikişîne ser xwe. Sertîfê Virhewle, wekî mirovekî ecêb dihate zanîn, di nav gund de bi hemû kesan re têkil dibû û xwe dida hezkirin. Piştî qedandina leşkeriya xwe her dem qala tiştên ecêb dikir, gundi yan metel dihîştin an jî bêzar. Zimanê fermî jî piçekî fêr bûbû, li ser hemû mijarên jiyanê agahî û nirx didan. Li ser wê pir axivîn, bi xwînşîrînbûn û ecêbmayîna wî re van gundiyên dûrî cîhanê nîvê van axaftinên wî vir dihesibandin. Lewma gundiyan ev nav bi vî mirovê sî û sê salî ve zeliqandibû. Lê tenê tekiliya wî û muxtêr ne baş bû. Ev jî ne bêsedem bû. Piçekî ji hevdu didexisîn. Wî demekê dixwest bibe muxtar. Le çawa?

Virhewle, niha jî li ser firxûnê dest pê kiribû, bi dengekî bilind stranek difirand:

- Min Qersê dikan vekir
Xezalê yêlî yêlî,
Bazarê min kir, te kir
Delalê yêlî can."

Muxtêr bi dengekî kûr ve niçandê:

- Sertîf, ca piçekî bisekine.

Sertif tê bê qet nabihîze, dom dikir:

- Wey wey bavo kêçê ez geztim, wî wî dayê ez geveztim...

Muxtêr îcar dengê xwe bilind kir û qîriya:

- Sertif, qey gohê te ker bûne!

- Pî! Çi bû?

Êdî nêzî zozanê bûbûn. Muxtêr ji dûr ve tişt şanî wan didan. Ji nava zozanan çend kon û naxireke sivik kifş dibû. Destê wan li ser eniya wan, li qeratiya mêze kirin. Niqlê hemûyan sist bû. Ev kêf û coşa wan gava din ji nişkê ve winda bû. Kesên li nav konan jî ew dîtin. Lewma nêzî çardeh, panzdeh mirov ji konan veqetiyan, hatin sînorê zozanê. Piçekî şûnde gundî jî gihîştibûn sînor, di nav meteliyekê de bêdeng disekinîn.

Muxtêr devê xwe çêdikir, dikir bi vê tirkiya xwe ya nîvco ve hevokekê serast bike. Lê kambax hê jî tu peyvek ji devê wî derneketibû.

Eceman zozan zeft kiribûn. Di destê çend hebên wan de jî li ser qirmeyê ber şalê wan de disekinîn. Dûre ecemekî çavzelal û dirankerxot bi wî dengê xwe yê vix got:

- Qardaşlar xoşgelirsiniz. Bilirem eskîde bu laylayî siz otariftiniz. Lakin yerimiz dardi. Înehlerimiz aç kaliftî. Biz de istedik, valî beg îndî burayî bize veriftî. (Birano hûn bi xêr hatin. Em dizanin ev berê zozanên we bûn. Lê cihê me teng bû. Mîrza walî dakete jêrê, ev der da me)

Muxtêr, bi hêrsa di dawiyê de çend hevok tevlî tûka devê xwe ve firandin:

- Evê cêc çi dibêje!? Biz geçen yil da gelmiş, her yil da gelmiş. Kim kime vermiş? (Em par jî pêrar jî hatibûn. Kê daye kê?)

Gundi û xortan xwe rakişandin eceman, şivdarên xwe bilind kirin, berve eceman çûn. Lê muxtar û kalan bi çeplê wan de digirtin. Wan jî nikaribû li dijî wan tiştekî bikin. Ecem bi çend gavan dûr ketibûn, qirmeyê xwe jî tazî kiribûn. Lê Virhewle û çend xort nedisekinîn. Virhewle di dawiyê de teqiya:

- Ola sizin de îneklerinizin de val, vall... va. (Çêlekên we jî hene...)

Le ev peyva dawî di devê wî de neqediya. Di bin awirên mezinan de dîsa xwe girtin û sekinîn. Muxtêr û kalan Virhewle û xort piçekî dûr xistin, dan rûniştin. Niha li hev dixêwirîn. Zozan ya wan bû; walî jî dizanî, eceman jî, hemû kesan jî. Le tu kaxiz û ewraqeke fermî ya zozanê li ser wan îspat bike jî tune bû. A kesekî ji tune bû.

Tijekirina eceman her roj pêşve diçû. Gundiyan ev baş dizanî. Komara nû, kesên nêzî mijara xwe şûm dikirin, kirinên wan ne dinêrî, destê xwe li pişta wan dida, li dû neheqiyên wan disekinî. Lê li gori fikra piraniya gundiyan jî muxtarê wan piçekî genefis bû. Zû sist dibû.

Bêgûman, dikaribûn li wê derê bastêqa eceman derxin, çêlekê wan ji xwe re bikin qelî. Lê mîratê ew tirsa leşker û wezîfedarên fermî tevlî nezanîna zimanê fermî dest û lingê wan girêdida, dikirine nav dudiliyê û beçar dihiştin. Gelek cerbên tirsêhêz ve hatibû li serê bav, kalên wan û wan. Yek û yek jiyabûn. Ji ber sedemên biçûk, carnan jî qet bêsedem lêdan û heqaret xwaribûn. Heya qala derdê xwe kiribûn, êş û rewşa xwe îfade kiribûn; cendekê wan li aliye cendermeyên her dem amadeyî lêdanê ve di nav reş û şîniyê de mabû. Di dawiyê de jî lêdan lê mabûn. Di bin van hemûyan de muxtar û kalan xwe dinirxandin, şêwra xwe xilas kirin. Gihîştibûne biryarekê, dê aşkera bikirana.

Niha, êdî dawiya koçê gihîştibû serê koçê. Kal, pîr, jin, xort, zarok û ajalan li sînorê zozanê xileporteke mezin çêkiribû. Her yekî ji aliyekî ve pêgermokek digerand, reh û cendek her diçûn dişidiyan.

Muxtêr rewş didît, lewma heya ji destê wî hat dengê xwe bilin dikir û bangî gundiyan dikir:

- Min û kalan, me biryar da. Em ê vegerin gund. Lê ev wiha namîne. Hûn niha tiştekî nepirsin. Tapûya me tune, em zimanê wan nizanin, kesek li pişta me nîne. Dibêjin walî destûr daye... De kerem bikin.

Serê hemû gundiyan berjêr bû. Muxtêr di dawiya axaftina xwe de dengekî nizm û girî ve di ber xwe de got:

- Serê keçel xweş e di bin kum de!

Virhewle û çend xortan di ber xwe de dikirin pilepil:

- Genefis! Genefis... Te dît, zozanê mîna xelatekê dide wan.

Gundiyekî dinê digot:

- Na lo! Bi vî awayî nahêle, dê serast bike.

Virhewle, bi hêrs bersiv digihandê:

- Ê bike! Min xweliya sar li serê we kiro! Ê neke!

Koça wan bêçar berê xwe zivirand. Hemû gundî di bin giraniya neheqî û şkestina xiyalan de bi şûn de dikişiya. Ew dengê yê ecem ê vix carekê dîsa hatê bîhîstin:

- Bu torpaxlar hemsimize yeter. Digorin her yeri layladir, gedin oralara! Qardaş qardaş yaşayax. (Ev ax têra me tevan dikin. Her dera Dîgorê zozan e, herin wan deran. Ew wekî bira bijîn.)

Virhewle jî, di destê wî de baçikek dikişand. Bêhneke kûr kişand û serê xwe zivirand eceman:

- Qardaş qardaş ha! Hûnê bibînin, qardaş!

Roj êdî ber bi êvarê ve diçû. Koç di hevrazekî de hildikişiya. Tîrêjên rojê yên xwar û xurt xwe digihandine cendekên van gundiyên xemgîn û westiyayî. Kortikên wan sipsor bûbûn, wan jî car caran pêçiyên xwe dixwerandin û bi dûr diketin.

Muxtar û gundiyan di rê de biryara xwe guherand, dê biçûna zozanên gundiyên cînar ên li ser riya wan. Xwe ji xwere digotin: "Em şerpeze bûn. Pez û dewarên me dê qir bibin. Ma cînarî, pismamî çima mirî ye? Em bi wan bawer in. Ne wisa?"

Wisa jî bû. Gundiyên cînarên wan, ew bi mêvanpereziyeke mezin ve qebûl kirin. Li kêleka xwe bi cih kirin. Gundiyan, bi alîkariya pismamên xwe konê xwe zûtir vegirtin.

Niha li kêleka konekî rûniştibûn, dewê bizinan yê sar û bi kef ji destê qîzikan digirtin û vedixwarin. Gundiyên dinê jî dilşikestî û xemgîniya cinarên xwe parve dikirin û li dijî wê neheqiye jî, jê re digotin: "Em dixwazin tevlî we êrîşekê li ser wan bikin. Roj, roja xîretê ye. Îro hat serê we, dê sibê bê serê me. Kî dizane, dibe ku sibê an jî du sibe dest bavêjin zozanên me, wan ji zeft bikin.

Yekî din digot:

- Na lo! Ewqas jî na!

- Na?

- Na, Na.

- De rabin, em rakevin. Xew çêtir e ji rûniştinê.

- Rast e!

- Kerem bikin.

- Şevbaş!

## Berxê nêr

***Ji Ehsan Fetahiyan re***

*biharên keskesor didoşim her sibeh*
*ji guhanên hêviyên mijgirtî*
*şervanên çavsor kedî dikim*
*li çar parçê dilê xwe..*

*şervanên çavsor kedî dikim:*
*sîngên wan navnîşana guleyan*
*stûyên wan evîndarê kindiran*

*tên û çarmêrkî rûdinin her sibeh*
*çarmêrkî rûdinin li ser sifra min*
*kezeba xwe dikim pêxwarin ji*
*wan re*

*xwezila we bidîtana*
*her yek bi qasî xwedayekî hêrs*
*bi qasî bendeyekî dildar bûn*

*biyaniyên jiyanê, pisporên*
*mirinê bûn her yek*
*xwezila we bidîtana di şer de*
*xwedêyo ma guleyek ew qas*
*tê li sîngekî*
*kindirek ew qas li stûyekî*

MIHEMED RONAHÎ



ROJEV
14 Mijdar 2009 Hejmar: 2 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com

## Ev tramway bi avê dixebite

Ne tenê ev tramway, her wiha hemû lambayên trafîkê û neqebên li ser xeta vê tramwayê jî bi avê dişuxilin. Hollandayê ji bo xatirê parastina xwezayê tramwaya ku bi avê dişuxule îcad kir. Ev tramway dê ji serê sala bê şûn ve berê li navçeya Utrechtê û piştre jî li navçeyên din bikeve xizmeta gel. Bi teknîka ku hatiye îcadkirin, ne tenê ev tramway, her wiha hemû lamba û neqebên li ser xeta vê tramwayê jî bi avê dişuxilin. **AMSTERDAM**



# Rewşa karkerên êzdî xirab e

SERBAZ SIYAMEND - HEWLÊR / DÎHA

Karkerên êzdî yên ku ji Şengalê ji bo kar tên Zaxoyê, di nava rewşeke nebaş de jiyana xwe didomînin. Karkerên êzdî ji ber gef û hin êrîşan di nava rewşeke xeter de ne û ji ber karê ku rojane dikin her roj bi mirinê re rû bi rû dimînin.

Karkerên êzdî li Herêma Kurdistana Federal ji bo jiyana xwe ya rojane bidomînin, bi her awayî têdikoşin. Ji ber wê jî rastî gelek zext û tengasiyan tên. Karkerên êzdiyên Şengalê, niha li qezaya Zaxoyê dixebitin. Karên ku di 5'ê mijdarê de ji bo maçekê futbolê çûn Dihokê, dema vegerê rastî êrîşa komek qerebalix hatibûn. Karkerên êzdî pirsgirêk û rewşa xwe ya xebatê ji ajansa DÎHA'yê re vegotin. Karkeran diyar kirin ku ji ber gef û êrişên hin derdoran di nava rewşeke xeter de dijîn û ji bo jiyana xwe bidomînin jî neçarî vê rewşê dimînin.

> Li Zaxoyê karkerên êzdî ji ber şert û mercan di nav rewşeke xeter de ne û her roj bi mirinê re rû bi rû dimînin. Karkeran destnîşan kir ku ji bo jiyana xwe ya rojane bidomînin bi her awayî têdikoşin

**300 kes ji bo kar hatine**

Karkerê bi navê Mecîd Tamîr, diyar kir ku ji bo pêdiviyên xwe yên rojane bi cih bînin, diçin derveyî Şengalê û wiha got: "Em ji bo kar diçin gelek bajaran. Gelê li Hewlêr, Silêmanî û Duhokê ji bo me baş in. Lê li Zaxoyê hind kes neheqiyê li me dikin û êrişî me dikin. Helbet li Zaxoyê kesên baş û yên xirab jî hene. Hin kesên xirab çêran li me dikin, gefan li me dixwin û êrişî me dikin. Ev 6 sal in ku em li wir kar dikin. Em hemû kurd in, em hêvî dikin ku bela xwe ji me vekin. Em 300 karker in ji bo kar hatine Zaxoyê, hêvî dikin em vir wekî bira bijîn.

**Pereyên wan jî nadinê**

Tamîr, bal kişand ser şert û mercên kar û destnîşan kir ku rojê herî kêm 11 saetan kar dikin. Tamîr, da zanîn ku serê sibê ji saet ji 7'an heta 6'ê êvarî kar dikin û wiha axivî: "Rojane bi 15 heya 20 hezar dînarên Iraqê kar dikin. Gelek caran xwediyê kar pare jî nadin me û neheqiyê li me dikin. Hin kes jî xeberan li me û ola me dikin. Bi çavên kafiran li me dinêrin û kerivan tavêjin me." Tamîr, anî ziman ku ji bo karê 20 rojan tê Zaxoyê, ji bo çûn û hatina ji Şengalê heta Zaxoyê 50 hezaran dide û kar jî kêm e.

**'Min zehmetiyên mezin dîtin'**

Karkerê bi navê Cemîl jî, bi lêv kir ku cihê lê dimînin radizên jê re dibêjin qada karkeran û wiha got: "Lê cihên em lê dimînin, em nikarin tu pêwîstiyên jiyanî bi cih bînin. Piraniya jiyana min li Şengalê borî. Lê min di jiyana xwe de wekî van 6 salên dawî zehmetî nedîtibû. Mesrefa li vir zêdeye û kar jî nîn e." Karkerê ku ev 14 salan dixebite yê bi navê Bawer jî, derbirî ku ew di mal de 11 kes in û kesekî wan ku kar bike nîn e. Ji ber wê jî ji bo alîkariya debara mala xwe, neçar maye bixebite û got ew jî bo kar tên vir lê li vir kar nîn e.



## Li kar digerin

*Karker Seyda jî, anî ziman ku ji bo peydakirina pêwîstiyên jiyanê hatine Zaxoyê û kar dikin. Seyda, got hêvî dikin bi ciwanên li vir wekî bira bijîn û wiha got: "Ez ji bo kar ji Tilhûzêrî hatime Zaxoyê. Kar kêm be dîsa jî ez dilxweşim. Ji ber ku îdareyek me ya kurdî heye. Divê kurd hemû ji hev hez bikin û neheqiyan li hev nekin."*



# Ava bendava Uzun Çayirê zêde dibe

Hikûmeta AKP'ê li Dêrsimê ligel bertek û nerazîbûnan xebatên bendavan didomîne, lê li aliyê din bi baranê re ava bendava Uzun Çayirê zêde bû. Her wiha welatiyan diyar kir ku zêdebûna avê ji bo derdorê xetereke mezin e.

Bendavên li ser Çemê Mûnzûrê têne avakirin ligel tahrîbat û wêraniya xwezayê, zirara li derdora xwe jî didomîne. Her çiqas welatiyên Dêrsimê û saziyên sivîl ên civakî li dijî bendavên li ser Çemê Mûnzûrê derdikevin jî hikûmeta AKP'ê di çêkirina bendavên li ser çemê Mûnzûrê de bi israr e. Ligel bertekên gel xebatên bendavên Akyayik, Konak Tepe, Konaktepe Hîdro Elektrîk 1, 2, Kaletepe, Bozkaya û Kemerbel didomin. Her wiha Bendava Uzun Çayir ku înşaata wê bi dawî bû, piştî di 17'ê tebaxê de pêşiya avê hate girtin, gelek gundên derdorê di bin avê de man. Bi baranê re mêzîna avê bi lez bilind dibe.

Ava bendavê nêzîkî li bajarê Dêrsimê kir û gelek baxçe, parqên zarokan û havîngehên welatiyan di bin avê de man. Bendav, bi bilindbûna avê re gefan li derdorê dixwe û weletiyan tengezar dike. **DÊRSIM (DÎHA)**



# Bo helîna lemlateyan hêviyeke nû

Zanyarên Amerîkayê ji bo nexweşiyên wekî helîn û qelsbûna lemlateyan (kas) rêbazeke tedawiyê ya genetîk pêş xist. Rêbaz li ser meymûnan bi serkeftin pêk hat. Lê hêj li ser mirovan nehatiye ceribandin. Ji ber vê jî nayê zanîn ku ji bo nexweşiyê bibe çareserî yan na. Li DYA'yê ji Navenda Terapî ya Gen Janaîah Kota bi hevalên xwe re lêkolînek kir û encama vê lêkolînê di kovara Scîence Translatîoanl Medîcîn de weşand. Kota anî ziman ku rêbazeke nû ya bi navê Multîple skleroz afirandine û her wiha destnîşan kir ku dê ev rêbaz ji bo nexweşiya helîna lemlateyan bibe hêviyek. **WASHINGTON**



3. Pêşbirka çîrokan a Abdullah DURAN

ŞERT Û RÊBAZÊN PÊŞBIRKÊ

1- Zimanê pêşbaziyê bi kurdî û tirkî ye; kurdî bi zaravayên kurmancî û dimilî.
2- Çîrok dê ji hêla bikaranîna ziman, tevn û honandina wêjeyî û rûmatdayîna nirxên mirovane û şoreşgerî bê nirxandin.
3- Di hêla naverokê de tu sînorkirin nîn e. Çîrok dikarin ji bo mezinan hatibin nivîsandin.
4- Divê çîrok bi riya kompîtirê bêne nivîsandin piştî roja 31.01.2010, berhemên ku bên dê nayên nirxandin
5- Şaxa Amedê ya Egitim Senê mafdar e ku çîrokan çap bike û çîrokên ku gihîştine lijneyê dê li xwediyên wan neyên vegerandin.
6- Sînorê kurtî û dirêjiya çîrokan nîn e.
7- Beşdar, bi her ziman/zaravayî tenê dikarin bi berhemekê beşdar bibin.
8- Li gorî derfetan, di serî de berhemên ku xelat wergirtine dê wekî pirtûk bêne çapkirin.
9- Encama pêşbirka ku dê bi kurmancî, dimilî û tirkî bê lidarxistin dê di 22'yê adara 2010'an de bê aşkerakirin.
10- Xelat dê li Amedê di 28'ê adara 2010'an de bi merasîmekê bêne dayîn.

XELATÊN PÊŞBIRKÊ
Kesên yekemîn : 1000 tl
Kesên duyemîn: 750 tl
Kesên sêyemîn: 500 tl
Her wiha jibo berhemên 4, 5'emîn û 6'emîn jî xelata mansiyonê dê bê dayîn

Endamên Jûriyê Beşa Kurmancî
1- Haydar Diljen
2- Merdan Newayî
3- Yaqob Tilermenî
4- Dilawer Zeraq
5- Azad Zal

Endamên Jûriyê Beşa Kirmanckî
1-Îrfan BABAOGLU
2-Suleyman YILMAZ
3-Cafer YAMIŞ
4- Sebahattin GULTEKÎN

Endamên Jûriyê Beşa Tirkî
1-Feyza HEPÇİLİNGİRLER
2-Suzan SAMANCI
3-Jaklin ÇELİK
4-Murat ÖZYAŞAR
5-Yavuz EKİNCİ

Serlêdan / Başvuru
EĞİTİM SEN
DİYARBAKIR ŞUBESİ

Adres/Navnîşan: Kalender Center Kat: 6 No: 9 Ofis/DİYARBAKIR
Tel: 0 412 223 27 54 - 0 505 482 30 50 - 0 533 635 86 52
e-mail: abdullahduranoyku@hotmail.com